

## Alayên Hemîdiyê

Di sala 1881'an de tê zanîn ku Şêx Ubêdullahê Nehrî hem li hemberî osmaniyan û hem jî li hemberî îraniyan serî radike. Siltanê demê Ebdulhemîd, li ser vê serhildanê, êdî pêşengên olî yên kurd di siyaseta Osmanî de îzole dike û dixwaze wan mînîmîze bike... Sedat Ulugana / RÛPEL - 8



## Ez anketçî niya!

Ez çalakî Enstîtuya Kurdî ya Stenbolî ra vecêna. Lezê mi est o. Gere ez biresî cay xo. Bi leze leze ez gaman erzena. Nişka vera jo vano: Deqeyke!

Kuçe de kam veyndo mi, muhîm niyo ew parsek bo, firoşkar bo... Cemîl Oguz / RÛPEL - 9



## Kurdên dûr û dilên nêzîk

Di nav kurdên Xorasanê de û helbestên gelêrî de, helbesteke sê rêzîn (sêxiştî) heye ku dibêje;

*Welatê me Erzirûm e*
*Bi giya û gul û tûm e*
*Heft salêm ez jê dûr bûme...*

Elî Reza Spahî Layîn / RÛPEL - 12


Rojnameya Heftane

# xwebûn

www.xwebun.org

6-12 Çile 2020
Hejmar: 3
Buha: 4 TL

rojname@xwebun.org


## Divê her kes di axaftina kurdî de bi israr be

Dema ku behsa helbesta kurdî ya nûjen dibe, Berken Bereh wek yek ji stêrkên geş ên esmanê helbesta nûjen a kurdî derdikeve pêş. Helbestvan salên dûvdirêj wekî evîndarekî zimanê kurdî, wî û helbestan di şîn û şahiyan de, di tengasî û firehiyan de hevaltiyeke rasteqîn bi hev re kirine. Bereh çend roj berê mêvanê rûmetê yê 2'emîn Rojên Wêjeyê Kurdî ya Êlihê bû. Bereh têkildarî ziman, helbest û wêjeyê pirsên rojnameya me bersivandin û wiha got: "Dayik stûna mal û neteweyê ye. Bi saya serê wan çand û kultura neteweyekê tê parastin û dewrî nifşên nû dibe. Lew dibistana ewil mal e ku zarok li wir fêrî ziman, çand, kultura xwe dibe û şexsiyeta wî durûv û teşe digire. Bo vê divê ew ji her kesî di axaftina kurdî de bi israr û rik û inyad bin."... Hevpeyvîna Rizoyê Xerzî / RÛPEL - 4



# Li Iraqê şerê DYA û Îranê



DI DESTPÊKA SALA NÛ DE DYA'yê li Bexdayê di encama êrîşa hewayî de, fermandarê Parazvanên Şoreşê yê Hêza Qudsê ya Îranê Qasim Silêmanî, fermandarê hêzên Heşdî Şebî Ebû Mehdî El Muhendîsî û çend kesên din kuştin. Rojhilata Navîn dîsa dikele, Iraq bûye qada şerê navbera DYA û Îranê... RÛPEL - 7

## Ji Guher Xanimê heta Boudîcayê

Di her civakê de mînakên jinên şervan û pêşeng gelek in. Heta em dikarin bêjin di bingeha azadî û serxwebûna gelek civakan de rola jinan gelek mezin e. Di Kela Dimdimê de Guher Xanimê û rêbera eşîra Sînemîliyê Fata Reş û di serhildana Sasonê de Rindêxan, li Hindistanê Manîkarnîka û li Brîtanyayê keybanûya kabîleya Icaniyê Boudîcayê navê xwe li rûpelên dîrokê nivîsandine... RÛPEL - 2

## Mergê cinîyan yeno tîtîknayene

Ma kewtî serra neweye. Umudê her kesî oyo ke çîyê xirab ê ke serra 2019î de ameyî cuyayene 2020î de nêrî cuyayene. Her çiqas ke her kewtişê serra neweye de umud wina bibo zî her tewir şîdet eksê kêmîbîyayîşî zêdîya. Ma bi xeberanê qetilkerdiş û îdîayê 'xokiştişê' cinîyan dest bi serra neweye kerdî. Derheqê babete de Sosyolog û Rayîrbera Komeleya Cinîyan ya Roza Ruken Erguneşe qisey kerde... RÛPEL - 9

## Nûçeyên ji çar parçeyên welat

Gelê kurd di nav xeleka ji agir de di nav têkoşîneke mayînde de ye. Mijarên ku bi salan e tên nîqaşkirin di sala 2019'an de gihîştin astekê, lê îsal jî mijarên sereke ku dê bên nîqaşkirin yekitî û statuya kurdan in. Rewşa Rojava, niha di nîqaşên navneteweyî de cihekî sereke digire. Hêzên parastinê, bi hemû awayî di rewşa îstîşarê de ne. Li Bakur şer û pevçûn û operasyonên binçavkirin û girtinê didomin... RÛPEL - 6

## Tifaqa bêdilî

Rûsya di dîrokê de tu carî Tirkiyê wek dost û hevkarekî stratejîk nedîtiye. Rûsya ne wek dijmin, wek her welatekî di çarçoveya berjewendiyên xwe de nêzî Tirkiyeyê dibe û li ser vî esasî siyasetê dike.

Niha di navbera her du welatan de ji Sûriyeyê bigire heta Lîbyayê û ji peymanên aborî heya yên leşekerî têkiliyên wan hene. Lê ev gavên tên avêtin hemû taktîkî ne...



Felemez Ulug / RÛPEL - 7

Mizgîn Ronak

**Bexdenûs**

Rûpel - 2

Samî Tan

**Parastin û geşkirina zimanî**

Rûpel - 5

Şener Ozmen

**Hebû, tune bû**

Rûpel - 11

## Mele Mistefa Barzanî di Helbesta Osman Sebrî de

Osman Sebrî navekî din ê bêminetiyê ye bi raya min. Ji min ve wisa xuya ye. Ne ji jiyanê tirsiyaye, ne ji mirinê. Tu dibêjî qey çend car li ser hev jiyaye û dê bijî. Mineta xwe tune. Di hindava "prosaic" û "poetic"ê de ye... Selîm Temo /RÛPEL - 5



## Ji Kela Dimdimê heta keybanûya qebîleya Icaniyê

# Jinên ku navê xwe li dîrokê nivîsandine

Jin di her serdemê de ji bo azadiya xwe, civak û axa xwe têkoşiyane û bedel dane. Gelek caran pêşengî ji artêşên civaka xwe re kirine. Di her civakê de mînakên jinên şervan û pêşeng gelek in

NAVENDA NÛÇEYAN

Bê îstisna di hemû civakan de dema behsa dîrok, şer, serhildan û berxwedana ji bo azadiyê tê kirin, mêr tê hişê mirovan. Ev ji ber bervajîkirina dîrokê ye. Ji ber ku di dîrokê de, jin in ên ku ewil serî li hemberî zordarî, pergala desthilatdarî û mêtingeriyê rakirine û li ber xwe dane. Jin di her serdemê de ji bo azadiya xwe, azadiya civak û axa xwe têkoşiyane. Gelek caran pêşengî ji artêşan re kirine. Di her civakê de mînakên jinên şervan û pêşeng gelek in. Heta em dikarin bêjin di bingeha azadî û serxwebûna gelek civakan de rola jinan gelek mezin e.

Em dikarin di şerê azadî û serxwebûnê de rola jinên kurd û jinên cîhanê bi çend mînakan raxin ber çavan.

**Kela Dimdimê**

Destana Kela Dimdimê ku wek destana Xanê Çengzêrîn jî tê zanîn, di nav gelê kurd de bi nav û deng e. Ev destan bi rêya dengbêjan heta van rojan hatiye.

Berxwedana Kela Dimdimê di sedsala 17'emîn de li rojhilatê Kurdistanê pêk hatiye. Navenda serhildanê herêma Mergever e û berxwedan di dema hikumdarê Safeviyan Şah Ebbas ê yekemîn de pêk hatiye.

Pêşengê vê serhildanê Xanê Çengzêrîn, bi navê yê rast Emîr Xan e. Emîr Xan piştî li Girê Gozanê Kela Dimdimê ava dike, li hemberê Şah serî radike. Yek armanca Emîr Xan heye ew jî azadkirina kurdan ji destê dagirkeran e. Lê şerê li Kela Didimê ku 7 salan didome, di encama îxaneta navxweyî û dîtina rêyên av ên veşarî têk diçe û tê dagirkirin. Lê dayika Xanê Çengzêrîn Guher Xanim barûdên ku di dema avakirina kelehê de di bin kelehê de hatibûn bicihkirin dîteqîne û bi vî awayî keleh tê îmhakirin.

Di vê destanê de derveyî qehremaniya Xanê Çengzêrîn sekna dayika wî jî cihê pesindanê ye. Guher Xanim ji bo ku hem kela berxwedanê hem jî jin û zarokên kurd nekevin destê dijmin, bi kelehê re xwe jî feda dike.

Di rastiyê de ya ku destanê dike destana qehremaniyê û heta van rojan tîne sekna jinekê ye. Ev sekna jina kurd nîşan dide ku jinên kurd mirinê didin ber çavan lê tu carî xwe teslîmî dijmin nakin. Ev sekn, ji hemû serhildanên piştî Kela Dimdimê re jî jinan re dibe îlham û li ser heman rêyê dimeşin.

**Fata Reş**

Yek ji mînakên jinên kurd ku hê jî di nav gelê kurd de bi nav û deng e Fata Reş e. Fata Reş ku rêbera eşîra Sînemîliyê ye, piştî yek bi yek mirina mêrên eşîrê erka rêbertiyê dikeve ser milê wê. Fata Reş piştî destpêkirina Şerê Kirimê yê di sala 1853'an de li ser banga piştgiriya padîşahê Osmaniyan Abdulmecîd a ji bo eşîrên Kurdistanê, bi nêzî 300 siwariyên xwe ji bo tev li şerê Kirimê bibe diçe Stenbolê. Rêbertiya Fata Reş û çûyîna wê ya Stenbolê wê demê bala çapemeniya hemû cîhanê kişandibû.

Digel ku li ser mirina Fata Reş ewqas sal derbas bûne jî hê jî navê wê di bîra gelê kurd de zindî ye. Di roja me ya îroyîn de jî dema jinek gelek jêhatî be û bikaribe artêşekê bi rê ve bibe, wê jinê dişibînin Fata Reş.

**Rindêxan**

Mînaka din jî keça pêşengê serhildana Sasonê (1926) Mihemedê Eliyê Yûnis Rindêxan e. Rindêxan ku hem ji aliyê leşkerî hem jî ji aliyê ilmî ve hatibû perwerdekirin, bi awayekî çalak di nav serhildanê de cih digire. Rindêxan hem bi sekna xwe hem jî bi wêrekiya xwe di serî de ji jinan re ji hemû serhildêran re dibe mînak. Lê wekî serhildanên kurdan hemûyan ev serhildan jî têk diçe, piranî şervanên serhildanê tên qetilkirin û Rindêxan jî bi birîndarî dibe dîl. Lê di dema dîlgirtinê de, fermanderekî leşkerên tirk ji xweşikbûna Rindêxan bi bandor dibe û dixwaze wê bi xwe re bibe. Rindêxan dema derketina ji ser axa bav û kalên xwe li ser pira Malabadê ji fermandarê dixwaze cara dawî li warê xwe binihêre. Piştî destûrdayîna fermandar, Rindêxan diçe ser pirê û ji wir xwe diavêje çemê Batmanê.

Ev sekna Rindêxan nîşan dide ku ew jî li ser şopa jinên beriya xwe meşiyaye û bi vê sekna xwe di nav jinan de bûye efsane.




**Rani Lakshmibai**

Ev jina ku navê wê yê rastî Manîkarnîka ye, li Hindistanê bi potreya li ser pişta hespê bi şûrê xwe û zarokê li pişt wê tê nasîn. Manîkanîka di sala 1857'an de li rojhilatê Hindistanê li dijî hêzên dagirkeriya îngilîzan ji Artêşa Raperîna Hindan re pêşengiyê kiriye.

Di sala 1857'an de hemû kralên eyaletên Hindistanê li dijî mêtingeriya îngilîzan serî tewandibûn. Lê keybanû Manîkarnîka ku piştî mirina hevjînê xwe derket ser text, serîtewandinê qebûl nekir û ji raperîna gelê xwe re pêşengiyê kir.

Wek gelek jinên pêşeng yek xeyala Manîkarnîka hebû ew jî derxistina dagirkeran ji ser xaka xwe û dîtina rojên azad bû. Lê li hemberî xeyalên Manîkarnîka derveyî hejmara leşkerên dargirkeran, îxaneta navxweyî jî hebû.

Di raperîna li dijî mêtingeriya îngilîzan de her çiqas Manîkarnîka têk biçe jî serîrakirina wê ya li dijî dagirkeran ji hemû raperînên Hindistanê re bû îlham.

Di roja me ya îro de jî jinên Hindistanê, hê jî bi hin rîtûelan Manîkarnîka bi bîr tînin û minneteriya xwe pêşkêş dikin.

**Boudica**

Têkildarî jiyana Boudîca pir tişt nayê zanîn. Lê bi qasî tê zanîn Boudîca keybanûya qebîleya Icaniyê ye ku B.Z. di sala 61'an de li dijî hêzên Romayê a li Brîtanyayê serhildan daye destpêkirin. Serhildana qebîleya Icaniyê ku bi pêşengiya Boudîca hatibû destpêkirin, bi taktîkên xwe yên şer fikra vekişandinê di hişê fermandar û împaratorê Romayê Neron de daye çêkirin. Her ku serkeftina Boudîcca belav dibû, hêzên din ên gund û bajarokan jî tev li artêşa wê ya serhildanê bûn.

Helbet ev tenê çend mînak in. Di dîroka jinên kurd û jinên cîhanê de gelek jinên bi vî rengî hene ku ji artêş û serhildanan re pêşengî kirine û bûne sembol. Di roja me ya îroyîn de jî di serî de jinên li Rojava jinên hemû cîhanê bi hêz û sekna jinên pêşeng ên beriya xwe tev li têkoşînê dibin û li dijî dagirkeriyê li ber xwe didin.

Jin heya ku azadiya xwe bi dest bixin dê têbikoşin. Di sala 2020'an de jî jin dê bi çalakî û biryardariya xwe li dijî hişmendiya serdestan ku dixwazin bi qetilkirinê jinan ji dîrok û rastiya wan dûr bixin, têbikoşin û xwe bi rêxistin bikin.



# Bexdenûs

*Mizgîn Ronak*

Ji bin kavilan, ji bin xwelî û lehiyan, ji nav birînên ku devên xwe vekirine û dixwazin me bixwin re, merheba dîsa! Belkî sed sal, belkî rojek, belkî jî tenê pênc deqe derbas bû. Belkî em êdî ne em ew in, belkî jî tu tişt û tu der neguherî û em dîsa em in, li vir in, li wir in, li her derê û her demê ne. Li her derê û her demê jî em ên kevn û nû, ji serborî û dubarehiyan merheba!

Van rojan ev nûçe dîsa pir li pêş in: "Derî şikandin û ketin hundir. Çekan spartin serê me, me li erdê dirêj kirin." Erê ew wiha ne, derî dişikînin, li erdê dirêj dikin, çekan dispêrin serê mirov, bi taybetî jî serê kurdan û zarokên wan. Gelo dibêjin qey bi vê faşîzmê dê kurdîtî bibe parçeyek jî wan çek û gotinên wan ên qirêj? An jî dibêjin qey dema ku derî tên şikandin û însan û kurd di mala xwe de, li ber hezkiriyên xwe û bi hezkiriyên xwe re wekî firaq û amûran li ber hev tên dirêjkirin, ew pê mezin dibin û yên din (kurd) biçûk dibin û dest ji kurdîtiya xwe berdidin?

Belkî jî dibêjin qey dê bi van êrîşên Nazîst; hemû travma, kompleks, fentezî û nizanim çi yên xwe derbas bikin, bibin kolonyalîstên (mijokdar) çêtir, hêzdartir… Lê nabe. Ev zilm me biêşîne jî we dixwe, dibe ser sergoyên kûçiktiya faşîzmê. Em dîsa sax in, em in, kurd in. Ji paş deriyên şikestî, malên talankirî jî bin, em dîsa em in. Çekên we yên ku hûn wan dispêrin serê me, xeyal, armanc û çîrokên di serê me de naqedînin, nakujin, nikarin bikujin. Ev serî dîsa eynî serî ne, heman tiştî difikirin û natirsin. Ev derî dîsa jî heman derî ne, deriyên malên kurdan, malên dijminên we…

Erê hûn bi vê wehşetê dijminahiya xwe hezar carên din jî îsbat dikin. Erê hûn dijminê mirovahiyê kurdîtî û şaristaniyê ne. Hûn dijminên xwe ne jî û dê ev dijminatî we biqedîne lew ên wek we jî qedandiye. Mînak; dîktatorek li Amerîkaya Latîn hebû. Tenê ji ber ku zimanê gelekî nagere ku navê bexdenûsê bi zimanê wan bêje ango bêje "parsley" (spanyolî: bexdenûs) bi hezaran mirovan kuşt! Çima? Lewre zimanê wan cuda bû, ne spanyolî bûn û nikaribûn "r" ya di "parsley" de bigotana! Loma jî hatin kuştin bi destên hevalbendên gurên boz. Lê dîsa jî ew in ên ku niha li bîra me ne, bes kes nizane ku ew dîktator niha li bin kîjan dojehê ye. Loma jî deriyan bişikînin bi qeyûman her derê talan bikin lê ev zilm pêşeroja we dişikîne, ne ya me. Ên ku dê di nav der û dezgehên welatê kurdan de ji ber karên xwe yên hipîheram tune bibin hûn in. Lewre binê pêlavek jî ji we hez nake, kêzikek jî lingê kûçikek jî. Hûn heram in heram!

## Hêvî Carinan…

Alîk X

Dibe ku navlêkirinên me pir bin, hinek bêjinê: “serdema neo-lîberal”, yan “serdema androîdî”, her weha, weke “elameta qiyametê” jî dikare bê navlêkirin; mebesta min ev dem, qirna 21’emîn e ku ji bo şolîkirina hişmendiyê ya bi rêya têgihanê ya ji aliyê otorîteyan ve erdekî biadan e. Hin caran, mirov di vê qirnê de, bi wê xezebê wateya xwe ji dest dide ku hebûn jê ve mîna erdekî beyar dixuyê; nikare der barê ‘jiyana takekesperest’ deku li welatê wî/ê yê hêlîna civakîbûnê bû- nafesile, çend kêliyan birame û bi çend gotinan biramîne… Ji ber ku mekanekî wî/ê yê xwe tê da bibîne jî tune ye, hemû dem jê ve nediyariyê dinimînin; gava ku mekanên wî/ê yên ramînê bên dagirkirin û dem jê ve nediyariyê binimînin, mimkin e ku mirov bi dilkêşiya bêwatebûnê bixape, di reşbîniya xwe da noq û nebedî bibe.

Di pêvajoyên weha erjeng de ku êdî kevir bi kevir, peyv bi peyv paşeroja me dihê tunekirin, mirov yek carinan dibêje xwe ku qey ew nifira çiniyan ku digot, “Hêvîdar im tu di wexteke seyr de bijî!” li hebûna wî/ê ya vê qirnê hatiye kirin. Lê hê ji mertalên me yên orjîn ên ku em bikaribin xwe bi wan bipesinînin û li hebûn û xwebûnê sor bibin, hene.

Ji roja ku mirovatiyê bîra mirinê biriye û heta niha pêdivî bi baweriyê jî ditiye, li gorî gelek antrpologan, vê sawa mirinê mirovatî arasteyî baweriyê kiriye; çi yên pirxwedayî (polîteîst) çi jî yên yekxwedayî (monoteîst), di bingeha hemû olan da sawa mirinê heye. Mirovatiya ku pêdivî bi bawerkirinê dîtiye, bê ku dîtina wî/ê ya şênber ew têxista dudiliyê, peyva “Xweda” li zimanê xwe zêde kiriye. Weke peyva “Xweda”, belkî mirovatiyê nav li gelek heyînên ku em bi awayekî şênber nikarin wan bibînin, kiribe, lê ji bo tiştên ku pêkanîna wan ji mirov û candarên din nayê, pêdivî bi tu lêkeran tune ye. Ligel tahlî û axira wê ya nediyar, bi îhtimaleke mezin wê ji ber arezûya vejiyandinê be ku mirovatiyê pêdivî bi navlêkirina dawîtirîn bizava xwe û rengdêra ku jê darişiye, li lêkera “mirin”ê û rengdêra “-mirî-”yê kiribe. Heger bi tena serê xwe rengdêra ku jê hatiye darişin, ango “-mirî-” hebûya û weke lêkerekê “mirin” tune bûya, mirov dikaribû bigota, dibe ku ew rengdêra ku jê hatiye darişin; ango “mirî” jî wekî navê “Xweda” nediyariyê dinimîne, lê na, ji ber ku hema bêje hemû candarên ku dişên bîr bibin, li ser wê yekê hemfikir in ku rengdêra “mirî”yê bi xêra lêkera “mirin”ê heye, ew bi awayekî endîrekt li ser hebûna lêkera mirinê û her weha li ser dawiya hebûnê jî dibin hemfikir.

Li gorî vê angaşta xwe, heger ku em bizavên ku pêkanîna wan ji mirov, candar û tiştên ku mirovan ew hilberandine tên, wekî şertekê hebûna lêkeran qebûl bikin, em ê li lêkereke ku bi qasî mertalekî polayî qewîn, li lêkera “desthilanîn”ê bivarqilin ku wê ew lêker, derewa desthilatdaran ku ji bo aşkirina bindestan îcad kiribû û digot ku di vê qirnê de “gur û mih bi hev ra diçêrin” pûç bike. Heger rast bûya, mebesta wan ne têkbirina psîkolojiya bindestan bûya; weke têgihên teolojiyê û axira mirinê nediyarî binimandana, dibû ku me weke mîstîkan xwe li guhê gê daniya, lê bindestan, qe nebûya kurdan pêdivî bi lêkereke weha dîtibû; desthilatdarên ku bi kiryarên xwe ew ji rewşa wan haydar kiribû, kurdiya kurmanciyê zorgayî lêkera “desthilanîn”ê kiribû, bindest bûn ango, ji bo weke pêşiyên xwe yên medî û eyibî bi serbestî bijiyana, divê ku destên li ser xwe hilanîyana; ji loma lêkera wan a “desthilanîn”ê hebû û weke mînaka Kobaniyê, wan bi xêra desthilanînê azadî tahm û bêhn kiribû.

# Ji bo çend quriş pere şer dikin

SMO’yê li Grê Spî welatiyê sivîl Omar Hisên Hecî qetil kir. Kesên ji bo çend qurişan şer dikin, nikarin bibin hêza aramiyê, tenê dikarin mirovan qetil bikin

QEDRÎ ESEN

Bajarên Grê Spî û Serêkaniyê yên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, bi êrîşa “Kaniya Aştiyê” ku di 9’ê Cotmeha 2019’an de ji aliyê Tirkiyeyê ve hatibû destpêkirin, hatin dagirkirin. Bi hezaran niştecihên ji van her du bajaran ji ber êrîşên li ser xwe malên xwe terk kirin û derbasî herêmên din ên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bûn.

Niştecihên ku li gund û bajarên van her du bajaran man jî, bi zordariyeke mezin re rû bi rû man. Endamên “Artêşa Neteweyî ya Sûriyeyê (SMO)” ku bi piştgiriya Tirkiyeyê derbasî van bajaran bûn, her roj bi ser malan de digirin û zilmek mezin li welatiyên herêmê dikin. Endamên Koma Feyleq El Mecid a SMO’yê roja destpêkê ya salê wesayîta welatiyê bi navê Omar Hisên Hecî desteser kirin. Dema ku Omar li dijî wan derket bi awayekî hovane ew qetil kirin.



**Xwestin ew radest bikin**

Malbata Omar û welatiyên Grê Spî li dijî vê qetilkirinê derketin û li dijî SMO’yê çalakî li dar xistin û ji SMO’yê daxwaz kirin ku kujerê Omar radestî wan bikin. SMO’yê berovajiyê vê daxwazê, li şûna ku kujer derxe holê 9 welatiyên sivîl revandin. Ji ber vê yekê acizaya di nav gel de derket asta herî jor û heta 3 rojan li dijî SMO’yê çalakî hatin lidarxistin.

Bi vê bûyerê re carake din derket holê ku kesên diz û ji bo çend qurişên pera şer dikin, nikarin bibin hêza avakirina aramiyê. Van komên ku ji aliyê Tirkiyeyê ve qaşo ji bo aramiyê li herêmê bi darê zorê hatin bicihkirin, bûne çavkaniya têkçûna aramiyê.

Ev komên ku li herêmê hatin bicihkirin, komên paramîlîter in û li gorî daxwazên Tirkiyeyê tevdigerin. Ji ber vê yekê tenê dikarin mirovan qetil bikin û ji bo berjewendiyên xwe yên şexsî ku bi diziyê pêk tînin, bixebitin. Ev jî nîşan dide ku ev kom li herêmê ne mayînde ne. Gelê herêmê ji ber pêkanînên xwe bêzar kirin. Kîjan roja ku gel firsend bibîne dê destpêkê berî van koman bide û bişîne cem xwediyên wan.

**Ew ê li holê bimînin**

Ne diyar e ku wê demê ji aliyê xwediyên xwe ve jî bên qebûlkirin an na. Tenê di rewşekê de dikarin ji aliyê xwediyên xwe ve bên qebûlkirin. Heke welatên di rewşa Libyayê de hebin û destê xwediyên wan di vî welatî de be dikarin bi kêr bin. Lê heke rewşeke wiha tune be dê îhtîmaleke mezin van koman li holê bimînin û kes paxav bi wan neke.

Îro jî ji ber ku destkeftiyên kurdan di hedefa xwediyên wan de ne bi kêr tên. Yanî di rastiyê de ne hêzeke wisa ne ku ji bo aramiyê li herêman bên bicihkirin û çek teslîmî wan bên kirin.

# Bîlançoya salekê ya şer û pevçûnan

NAVENDA NÛÇEYAN

Di sala 2019’an de gelek operasyonên leşkerî hatin lidarxistin. Van operasyonan li başurê Kurdistanê bi navê Pençe (Neprûk) û li bakurê Kurdistanê jî bi navê Kiran (Şikandin) hatin lidarxistin. Bi operasyonên Pençe-1, Pençe-2 û Pençe-3 gelek leşker di bejahiyê de derbasî başûrê Kurdistanê hatin kirin. Leşkerên ku li başûrê Kurdistanê bi cih bûn, bi gerîlayên HPG’ê re şerên dijwar kirin. Di encama van şeran de, gelek leşker û gerîla jiyana xwe ji dest da.

Dîsa di mehên havînê de jî bi navê Kiran li bakurê Kurdistanê gelek operasyonên leşkerî hatin destpêkirin. Van operasyonan heta dawiya salê hejmar li wan hatin zêdekirin û berdewam kir. Di van operasyonan de jî di navbera leşker û gerîlayan de şer û pevçûnên dijwar qewimîn. Li gel ku di van operasyonan de gelek leşker û gerîlayan jiyana xwe ji dest da jî mirina leşkeran ji aliyê çapemeniya alîgir ve hat veşartin.

**Bi sedan leşker mirin**

Di 2’yê çileyê de Fermandariya Biryargeha Navenda Parastina Gel (NPG), têkildarî bîlançoya van operasyonan daxuyaniyeke nivîskî weşand û daneyên wan parve kirin. Li gorî vê daxuyaniyê di operasyonên leşkerî yên 2019’an de hezar û 220 leşker û polîs û 456 gerîlayan jiyana xwe ji dest daye. Her wiha li gorî vê daxuyaniyê 6 gerîla jî dîl ketine destê dewletê.



# Li daşirê jî kurdî qedexe ye!

Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê ku di 19’ê tebaxa 2019’an de qeyûm tayînê wê hat kirin, 22 mizgeftên li bajar sererast kirin. Şaredariya ku ji aliyê qeyûm ve tê birêvebirin, piştî sererastkirinê, daşirên van mizgeftan jî kirin bê pere. Tabelayên hişyariyê yên ji bo vê rewşê, li têketina daşiran hat daliqandin bi tirkî û îngilîzî ne. Amed bajarekî kurdan e û bi salan xizmetên şaredariyê ji aliyê rêveberiya HDP’ê ve bi kurdî û tirkî dihat dayîn. Lê li gel vê yekê jî qeyûm xizmeta bi kurdî rakir û li şûnê îngilîzî bi cih kir.

**AMED**




# Di salekê de 252 kolber bûn qurbanî

NAVENDA NÛÇEYAN

Li Îranê bi salan e ji aliyê gelê rojhilatê Kurdistanê ve kolberî tê kirin. Kurdên Rojhilat ji bo bazirganiyê bi awayekî qaçax derbasî başûrê Kurdistanê dibin û danûstandinê dikin. Ev bazirganiya kurdan a navxweyî ji aliyê rejîma Îranê ve nayê qebûlkirin û kurdên ku bi vî şixulî re mijûl dibin tên qetilkirin. Li gel hemû bertekên kurdan jî ev yek ji aliyê Îranê ve nayê terikandin û her sal bi dehan kurd li ser sînor tên kuştin. Ji ber şert mercên ne baş ên çûnûhatinê jî bi dehan kolber jiyana xwe ji dest didin.

Di sala 2019’an de jî bi dehan kurdên ku kolberî dikirin ji aliyê rejîma Îranê ve hatin qetilkirin û ji ber şert û mercên nebaş jiyana xwe ji dest da. Rêxistina Mafên Mirovan a Hengawê ku mirin û qetilkirina kolberan her sal rapor dike, rapora mirin û qetilkirina kolberan a 2019’an aşkera kir. Li gorî rapora Hengawê li ser sînorê rojhilat û başûrê Kurdistanê herî kêm 252 kolber di sala 2019’an de jiyana xwe ji dest dane.

**Kolberên zarok jî hatine kuştin**

Di raporê de destnîşankirin ku ji van kolberan 72 jê ji aliyê rejîma Îranê ve hatine qetilkirin û 172 kolber jî hatine birîndarkirin. Di raporê de hûrgiliyên têkildarî mirina penaberan jî hatine parvekirin û li gorî vê yekê 50 kolber bi gulereşandina hêzên leşkerî yên rejîma Îranê hatine kuştin û kolberek jî ji ber teqîna mayînê jiyana xwe ji dest daye. Dîsa 23 kolber jî ji ber bûyerên xwezayî jiyana xwe ji dest dane.

Dîsa li gorî raporê 8 kolberên zarok ku temenê wan di bin 18 saliyê de ye, li ser rêya kolberiyê hatine kuştin. 6 kolberên zarok ji ber gulereşandina hêzên leşkerî yên rejîma Îranê û 2 kolberên zarok jî ji ber sermayê li ser rêya kolberiyê jiyana xwe ji dest dane. Li aliyê din di sala 2018’an de jî 241 kolber jiyana xwe ji dest dabûn, li gor sala borî mirina kolberan ji sedî 8.4 zêde bûye.

## Zimanê helbestê cuda ye ne zimanê rojane ye, ew zimanekî bi hêz û kûrtir e

# Ziman rukn û binyad e

→ RIZOYÊ XERZÎ

Zimanek ger ne zimanê danûstandin, ragihandin û yê bazar û perwerdeyê be nikare bi awayekî pergalî berê xwe fireh bike û berhemdar bibe. Li hember vê divê hişmendî û feraseta bikaranîna zimanî di nav gel de belav bibe. Hewldan bêne dayîn ku zimanê perwerdeyê bibe zimanê kurdî

### BERKEN BEREH kî ye?



Berken Bereh di sala 1954'an de li Şirnexê ji dayik bûye. Destpêkê helbestên xwe di sala 1979'an de di kovara Tîrêjê de weşandin. Nivîskar û helbestvan Berken Bereh berhemên xwe di kovar û rojnameyên wekî Nûbûn, Nûdem, Jiyana Rewşen, Nûbihar û hin kovarên din de weşandin. Heta niha gelek helbestên wî hatine wergerandin bo zimanên tirkî, erebî, farisî û firansî. Pirtûkên wî yên helbestan Êş, Şîna Helbestê, Dilê min balgeh e û Pandomîn çendek in ji berhemên helbestvan ên ku heta niha hatine çapkirin.

*Dema ku behsa helbesta kurdî ya nûjen dibe, Berken Bereh wek yek ji stêrkên geş ên esmanê helbesta nûjen a kurdî derdikeve pêş. Helbestvan salên dûvdirêj wekî evîndarekî zimanê kurdî, wî û helbestan di şîn û şahiyan de, di tengasî û firehiyan de hevaltiyeke rasteqîn bi hev re kirine. Me xwest em vê hevpeyvînê bi Berken Bereh re bikin û bi xwendevanên rojnameya xwe re par ve bikin. Fermo em bi hevre li helbestvanê xwe guhdarî bikin.*

***Rêzdar Berken Bereh, helbestkarê me yê hêja girîngiya helbestê û rola wê di alî pêşxistin û zindîkirina zimên de çi ye?***

Ger em helbestê wek avahiyeke xweşik û balkêş bihesibînin, ziman rukn û binyada vê avahiyê ye. Çawa ku avahiyeke bê bingeh dê pêk neyê û ne saxlem be, helbest jî bê zimên nikare bê nivîsîn.Vêca her helbestek bi saya zimên û li ser erdê zimên bilind dibe. Lê zimanê helbestê cuda ye ne, ew zimanê em pê diaxifin û bi hinekên din re têkiliyê datînin e. Ew zimanek kubartir, bi hêztir û kûrtir e. Lew di zimanê helbestê de gramer, hevoksazî û heta peyv jî ne wek ya zimanê rojane ye. Peyv ne tenê li gor wateya xwe ya ferhengî tê bikaranîn. Heta ew bi serê xwe nikare helbestê binimîne. Ji bo helbestê pêdivî bi hemû peyvan heye. Gelek caran peyv bi hev re dikevin têkiliyê û bi saya vê têkiliyê dibine xwedî wateyine cuda û dewlemendtir. Zimanê helbesta azad û ya klasîk bi vê taybetiyê ji hev tê cudakirin. Di helbesta klasîk de peyv li gor wateya xwe ya ferhengî bi peyveke din re dikeve têkiliyê û bi wê re tiştekê dinimîne. Lê tiştekê li hev zêde nakin, peyv her wek wateya xwe dimînin. Lê di helbesta modern de peyv bi saya danûstandina bi peyvên din û bi saya hêma (îmaja) bi kar anî reng, durûv û wateyeke din jî digire. Ango ziman û peyv di destê helbestvanî/ê de wek boyaxa wênesaz û heriya peykertraş e. Lê peykertraş û wênesaz nikarin wateyek din bidine herî û rengan. Helbestvan bi peyvan wê avahiyek wisa lê bike ku bi aheng, bi pergala xwe ya hundurîn û ya derve, bi sazkirina têkiliya di nav bera peyvan de wê rêya herî kin û bi hêz ya ku xwe bigihîne hiş, mêjî û ruhê xwendavên bibîne. Aha ev ziman zimanekî cuda ye û zimanê heyî jî li gor xwe bi hêz dike.

***We ji bilî kurdî bi zimanekî din helbest nivîsiye an na û çima?***

Beriya derçûna kovara Tîrêjê(1979) yanî beriya salên heştêyî min bi tirkî hin helbest nivîsandibûn. Lê bi derçûna Tîrêjê re min biryar da ku tenê bi kurmancî binivîsim.

***Gelek kes, çîrok, roman û helbestên xwe bi zimanê tirkî, erebî, farisî an jî zimanekî din dinvîsin, tevî ku ew nivîskar bi eslê xwe kurd in, gelo ew berhem dibin malê pirtûkxaneya kurdan, ji bo wê yekê hûn çi difikirin?***



Li jor bi berfirehî min behsa têkiliya helbest û zimanî kir ku ji wê jî xuyaye bo têkiliyeke dirist a civakî, parastin û ragihandina nirx û pîroziyên neteweî, ji nifşek bo nifşek din, ziman û wêje hêmanên sereke ne. Bê wê pergala danûstandin û şiyana xweragirtina li hember pest û pêkutiyên bişaftinê ne gengaz e. Vêca neteweyek encax bi berhemên bi zimanê xwe hatî afirandin dikare hiş û bîreweriya takekesî û ya civakî zindî bike, bihêle zindî bimîne. Dema tu bi van krîteran berê xwe bidî wêjeyê, ne gengaz e ku em berhemên bi zimanekî din hatî nivîsandin bikine malê wêjeya xwe. Kerseya wêjeyê ziman e û ya nasnameya wêjeyekê diyar dike jî ziman e. Lew berhemeke wêjeyî malê ew zimanê pê hatî afirandinê ye. Ji lew re warê nivîskar lê dijî û etnîsîteya wî nabe hêmanek bo berhema wî. Di gel ku behsa xem û kul û êşa civata lê dijî bike jî.

***Wekî hûn dizanin û li gorî nexşeya zimanan, 15 zimanên ku li Tirkiyê têne axaftin bi tunebûnê re rû bi rû ne, gelek jî wenda bûne. Zimanên wekî urgupî, mlahso û îbihî ji van zimanan in. Li Suriyeyê zimanê aramî, zimanê fenîkiyan ên ku cara yekemîn alfabe bi kar aniye di nav zimanên ku wenda bûne de ne. Li Suriye, Tirkiye û Iraqê di nav zimanên ku metirsiya windabûnê li ser wan heye asûrî, suryanî û keldanî jî hene. Zimanê kurdî bi taybetî jî li bakurê Kurdistanê wekî hûn dizanin her ku diçe kêm tê bikaranîn û ji bo ku pêşî li metirsiya windabûna zimanê kurdî were girtin divê kurd çi bikin? Di vî warî de plan û projeyên nivîskar û rewşenbîrên kurd çi ne?***

Ez bi xwe ne hewqasî reşbîn im. Neteweya kurd îro roj gelek çalak û li ser xwe ye. Roj bi roj berhemên wêjeyî û hejmara nivîskaran zêde dibe. Gelek berhem gihane çapên 3 û 4'an. Baldarî û hişmendiyek heye. Helbet ev bi tena serê xwe nikare bibe enerjiyek bo ziman bikare barê netewebûyînê ragire. Ji tecrubeya gelek neteweyan dîyar e ev bar barê rêxistinên siyasî, komele sazî û dezgehên bi berpirsiyariya hizra neteweyî radibin û rûdinin e.Yanî yên ku xwedî hêz û erkeke civakî ne dikarin bi plansaziyekê rê li ber astengiyan bigirin. Nivîskar wek takekes ji afirandina xwe berpirsiyar e. Hewl û armanca wî/ê ew e ku berhemên serkeftî û xwedî pîvanên wêjeyî diyarî civata xwe bike.

***Hûn wekî xemxurekî zimanê kurdî ku salên dirêj bi karên ziman û bi taybetî jî di warê helbestê de xwedî berhemên hêja ne, rewşa heyî ya zimanê kurdî çawa dinirxînin? Li gorî we astengî û pêkanînên li dijî zimanê kurdî çi ne û mirov çawa dikare wan pûç bike?***

Di gel ku roj bi roj xwîner û nivîsandina kurdî di nav gel de bi pêş dikeve jî, ji ber nebûna perwerdeya zimanê kurdî li dibistanan rewş ne li gor dilê min e. Zimanek ger ne zimanê, danûstandin, ragihandin ê bazar û perwerdeyê be nikare bi awayek pergalî berê xwe fireh bike û berhemdar bibe. Astengiya herî mezin ev e. Li hember vê divê hişmendî û feraseta bikaranîna zimanî di nav gel de belav bibe. Hewldan bêne dayîn ku zimanê perwerdeyê bibe zimanê kurdî.

***Çi pêşniyarên we ji bo siyasetmedarên kurd û partiyên kurdistanî hene û ew dikarin di vî warî de çi bikin?***

Çi gotinek min nîn e. Ger ji kerema xwe re ev derdor hema saetekê biçine serdana rojname û kovarên kurdî dê rastî bi sedan pêşniyar û lave û daxwazan bên. Bi min helwest û sekna wan rolmodêla herî xerab an a herî baş e. Divê siyasetmedar hay ji vê kartêkeriya xwe hebe.

***Di dema dawî de bi tevlêbûna 10 partiyên kurd platforma zimanê kurdî ava bû. Çi pêşniyarên we ji bo vê platformê hene?***

Li ser xêrê be, hatinabahev, hevkariya bo zimanî bi serê xwe hêjayî pesindanê ye, hêvî dikim ku bi bername û çalakiyên bên lidarxistin bikin ku nivîskar di çûn û hatina wan çalakiyan de biwestin û gazindan bikin. Bi ya min ev hevpeyvîn gere bi wan re bihata kirin.

***Li bakurê Kurdistanê ji aliyekî ve tabelayên kurdî tên rakirin û li aliyê din televîzyona fermî ya dewletê bêyî fermiyeta zimanê kurdî weşanê dike. Hûn vê rewşê çawa dinirxînin?***

Helbet ev sekn û helwest neheqiyeke li hember zimanê kurdî. Hemû welatên serdest dibêje ne bi destê min be ez destûrê nadim tu bernameyên civakî. Ji xwe feraseta wan ev e, şiarek wan heye "hewceyiya me bi çi hebe wê jî em ê bînin". Kesê/a xwedî vê hişmendiyê dê nexwaze kurdî bibe xwedî hêz û şiyan û reng û durûvê civatê saz bike.Yanî pergalên bişaftîner ne tenê bo ziman lê di her qada jiyanê de tişta ji xwe re xeter bibînin rê nadin wê û dîwaran li berê ava dikin.

***Berê me digot zimanê dayikê lê mixabin dema niha em li kolanên bajarê kurdan ên bakurê Kurdistanê dinihêrin, êdî zimanê dayikê jî nemaye. Ew maye zimanê kal û pîran… Gelo banga we ji bo gelê me yê bakurê Kurdistanê û bi taybetî dayikan çi ye?***


Dayik stûna mal û neteweyê ye. Bi saya serê wan çand û kultura neteweyekê tê parastin û dewrî nifşên nû dibe. Lew dibistana ewil mal e ku zarok li wir fêrî ziman, çand, kultura xwe dibe û şexsiyeta wî durûv û teşe digire. Bo vê divê ew ji her kesî di axaftina kurdî de bi israr û rik û inyad bin.

***Rojnameya Xwebûnê nû dest bi weşana heftane kir û ji bo xwendevanên rojnameyê peyamên we hebin, dikarin bidin. Her wiha ger hebe, gotina we ya dawî dikarin bibêjin?***

Ez ji Xwebûnê re temenek dirêj dixwazim û banga min ew e ku xwendevan ne tenê bixwînin belavkirin û xemilandina rûpelan jî ji xwe re wek erkekê bibînin.

***Ji bo hevpeyvînê em spas dikin.***





Mertal

Selîm Temo

# Mele Mistefa Barzanî di Helbesta Osman Sebrî de

Osman Sebrî navekî din ê bêminetiyê ye bi raya min. Ji min ve wisa xuya ye. Ne ji jiyanê tirsiyaye, ne ji mirinê. Tu dibêjî qey çend car li ser hev jiyaye û dê bijî. Mineta xwe tune.

Di hindava "prosaic" û "poetic"ê de ye. Ne dîlê wateyê ye, ne yê hêmayê. Dikarî bêjî jiyana wî jî wek helbesta wî ye. Ji kesî nexwariye, diyar e.

Herçî Mele Mistefa Barzanî ye, olaneke kevn e ji dilê min. Her li hespekê kapreş siwar e, tifengek li mil e. Yekem weşana îllegal a min dîtî, kovara Xebat bû ku alîgirên wî belav dikirin. Berg û rûpelên zer, tîpên reş ên bi qemçik. Di ser de kilama behsa mirina wî li dûrî welêt dike ku bavê min her distirê.

Min wisa dizanî ku ez ê careke dî nejîm, lê ew olana kevn olaneke nû diviya. Rabûm min dest bi antolojiyekê kir: Sed Helbest bo Mele Mistefa Barzanî. Ji Kafkasan heya Kirmaşanê, ji Urmiyê heya Efrînê gellek helbestvan bo Barzanî helbest nivîsîne. Hin ji wan ji xwe re kirine edet ku serê salê helbestek binivîsin, wek Hejar Mukiryanî.

Ji her helbestvanê/î helbestekê digirim. Min ji pêncî helbestî, ango helbestvanê/î derbas kiriye. Îca gava bû pirtûk, ez ê her helbestê li ser fotoyê riwekeke endemîk a Kurdistanê raxêlim. Dostekî 96 heb bo min peyda kirin, man 4, dê hebin.

Antolojî sê beş in: Jîn, Têkoşîn û Şîn. Ji binnavan diyar e ka çi cure helbest diçin kîjan beşê. Lê helbestên Osman Sebrî li tu beşê nayên! Gava hatim ser helbestên wî, plansaziya antolojiyê lê asê ma. Min digot qey çi helbestvan hene her qencî û berxwedêriya Melê nivîsîne. Lê na, Apê Osman wî rexne dike. Osman Sebrî, Barzanî wisa rexne dike ku têxim nav antolojiyê, ji rêya armanca pêşîn dûr dibim. Heke yeka Apo tê de nebe ya dikim nabe hizbayetî? Wek "antolojîst" mafê min heye diyardeyekê tune bihesibînim?

Osman Sebrî di sê helbestên xwe de behsa Mele Mistefa Barzanî dike. Herduyên pêşîn rasterast li ser wî hatine nivîsîn: "Serdarê Bilind" (SB) û "Gazin ji Barzanî" (GB; Dîwana Osman Sebrî, Amd. A. Balî,2005, Berlîn, Evra Verlag). SB di 15ê Adara 1970yî de hatiye nivîsîn, GB di 15ê Hezîrana 1970yî de. Ya pêşîn pesn e, ya duyem rexne. Di nav sê mehan de ka çi bûbe, boçûna helbestkêr guheriye. Helbesta dawîn ne rasterast bo Barzanî ye, lê rexneyî ye ku navê xwe "Bersiva Hoşeng" (BH) e û dîroka nivîsînê 15ê Adara 1977an e.

Risteya pêşîn a SB weha ye: "Serdarê bilind gel te gîhand warê azadî" (44). Di vê helbestê de Barzanî "serdar" e, "xwedî" ye, "bavê dilovan" e, "gewreyê Kurd" e û "keştiya gel" gîhandiye "saxa aşitî." (Divê bibêjim; di nav çepgirên demê de peyva "aşitî/aştî", "kod"a sosyalizmê bû.) Digel van pesnan rexneya li "cahşên siyasî" jî bala meriv dikişîne. Yên navên wan nayên hildan gellek in, lê yên navên wan tên hildan Îbrahîm Ehmed û Celal Telebanî ne. Herdu jî ji baskê çep ê Partî Dîmukratî Kurdistan (PDK) bûn. Di helbesta nav borî de rexneyên Osman Sebrî bo Ehmed û Telebanî, zêde giran in:

*Waha dibînim, va tîrijên roya me dertên*
*Îbrahîm Ahmed, tevî Celal serî di ber tên*
*Tên ber derê te pabûs û sernizm û fihêtkar*
*Nizanim dê çawan rave te kin wan rûyên zengar*
*Zengarî bûbûn ji bêbavî xiniziya reş*
*Piştî çêriyan li Bexdadê têr xwarin kerbeş* (44)

Helbestvan bo wan dibêje: "Neqenc", "rûreş", "caşikên nezan", "ehmeq", "caşên siyasî" û "bê şerm û fihêt." Di pey re gotinê tîne du celeb "caş"ên li Sûrî:

*Li Sûriyê jî du celeb caş derketin meydan*
*Her celebekî di rêkê ra dan ser şopa wan*
*Lê gel dizanîn bêbav çawan hatin firotin*
*Li Şam û Bexdê bi destê Beis ew hatin dotin* (45)

Herdu risteyên dawîn jî ev in: "Bijî ji bo gel, her tu bijî Serdarê kurdan / Bijî serbilind gewreyê kurd di nav Kurdistan" (45).



Helbesta GB, yanê "Gazin ji Barzanî", weke min li jorê gotî sê meh piştî GBê hatiye nivîsîn. Lê di pirtûkê de li pêş e (42-43) û dirêjtir e. Herdu risteyên pêşîn weha ne: "Serdarê bilind te keys neda me em te pîroz kin, / Ji bo felata Kurdistanê te xwedî doz kin."

Guherîna boçûna Ap Osmên têkildar e bi gengêşiyên siyasî yên li Rojava. Ev yek mijara lêkolînê ye. Hêvîdar im dê şareza dîtin û zanînên xwe binivîsin. Ji helbestê xuya ye ku navbera Sebrî û Barzanî de dijminatiyek çêbûye. Helbest weha didome:

*Zûka te berê xwe guhazte min bi neyarî!*
*Holê dixwazî min biderxî di nav vî warî..*
*Peyva te kirî derheqê min gelek giran bû,*
*Peyvek dererê ne sezayê şêrê Barzan bû.*
*Çawan te karî wê gotina bibêjî!.*
*Jehra di dilê xwe de mayî holê birêjî…*
*Rast e berî vê çil salî bû xeydek di nav me,*
*Perdeke gelek reş û tarî xwe dabû çav me.* (42)

Weke xuya ye helbest dibe name. Jixwe Apê Osman notek daniye binê helbestê, dibêje: "Ev helbest bi destê kek Hebîb Kerîm, ku di wê demê de sekreterê PDKê bû, gîha destê M. Mustafa Barzanî" (43). Behsa hin tiştan tê kirin ku tenê herdu dizanin: "Wê gavê dîsa derheqê min tu bû sitemkar/ Kirek wekî wê navê bike çi kesê hişyar" (42). Xuya ye dilê wan ji hev dimîne, lê bi gotina Apê Osman berê Barzanî dikeve "rêya felatê." Li gorî helbestê helbestvan piştî vê yekê "rûpelên reş" diçirrîne û rika dilî vediguhêze bi "hezkirinek xweş."

Osman Sebrî gotinê tîne ser aqûbetê. Bi Barzanî re ye, lê "her du li pêş in", yanî Osman Sebrî û Barzanî li pêş in. Xwe ji wî kêm nake. Li gorî helbest-nameyê hin kes dixwazin navbera herduyan xera bikin. Osman Sebrî bo wan sîfetên weha bi kar tîne: "Nemerd", "bêbav", "qehpebav", "sût" û "gellac." Lê ew kes çi bikin jî helbestvan dibêje ez dev navêjim "Serdarê Kurdan." Bo têkoşîna neteweyî divê hin nakokî bên piştguhkirin:

*Welat hewceyî têkoşîna me hemiyan e,*
*Ne Kurdê bîrbir, gundî jî vê rastiyê zane.*
*Rewşa gelê Kurd divê îro em wek bira bin,*
*Heya bikarin di şeva Kurd wekî çira bin.* (43)

Digel vê yekê dilê helbestkêr ji Melê maye. Li ber xwe dikeve û dengê helbest-nameyê bilind dibe:

*Têkoşerê çil salî re "xaîn" nayê gotin:*
*Dema bê gotin zor fihêt e, rastî tê sotin.*
*Dirêjiya vî çil salê han herdem zîvar bûm,*
*Gel tev dizane vê rastiyê her bê hefsar bûm.*
*Hefsarê xurtan hê tucaran neket serê min,*
*Qelsî û kêmî hê tucaran nehat derê min.*
*Karî bipirsî li dora xwe, hemî hevalan,*
*Kesek heye ku bawer neke vê gotina han?* (43)

Apo navberek datîne bi risteya "Her kes ji me bi ramana xwe ketiye Xebatê." Em li vir helwesta helbestvên dibînin. Lê gelo peyva "Xebat" bo çi bi tîpa girdek dest pê dike? Qey kovara min behskirî ye!? Dibe ku ew jî weke peyva "aşitî", "kod"ek be.

Ber bi dawiya helbestê ve êdî şîret hene. Li gorî dengê ji helbestê tê divê Barzanî tiştên biçûk daneyne ser xwe. Lê bêminetî jî li dar e:

"Neyê bîra te ku mineta kesî hilînim, / Tenê di te de hêviya me Kurdan dibînim" (43). Helbest bi duayên tenduristî û serkeftinê diçe serî.

Osman Sebrî heft sal şûn de behsê dîsa tîne ser Mele Mistefa Barzanî. Di helbesta "Bersiva Hoşeng" de qala hin kesan tê kirin ku dibêjin:

*"Heke şoreş bimaya, welat seranser dibû wêran,*
*Di nav xerîta cîhan de radibû navê Kurdistan,*
*Teqez dê hebin hin gotin û peyman,*
*Di navbera Barzanî û Şahê Îran."* (210-11)

Xuya ye hin kes têkçûna mezin a piştî girêbesta Cezayîrê rasyonalîze dikin. Sebra xwe bi gotegotan tînin, xwe dixapînin. Rexne li Barzanî nakin, lê Osman Sebrî bi carekê diqîre:

*Ev e gotina min, ji van celeb kesan:*
*"Bimirin, biqesin herin nik şeytan,*
*Divê hûn bizanin ku Barzanî xwe kuşt,*
*Xwîna cengewerên kurd bi dolaran şuşt,*
*Rûmeta xwe û kurdan siparte neyar,*
*Ji bo we keran her bindestî hişt."* (211)

Girêbesta Cezayîrê. Sal 1975 bû, Îran û Iraq li hev kirin, Kurd li ortê man, hatin qetilkirin. Osman Sebrî rexne li vê yekê dike. Sala helbestê 1977 e. 40 sal derbas bûn. Kerkuk. Têkçûn. "Xaîn"tî.

Du nemir. Yekî gorrek xwest li axa xwe ku ji dûr ve nexuye. Yekî gorrek dixwest ji Yezdanî "di sersiya" çiyan de. Herdu jî olan didin ji hevrazekê.







Ziman û Raman

Samî Tan



# Parastin û geşkirina zimanî

Ev çend hefte ne, em qala helwesta zimanî dikin. Di nivîsên berê da me bal kişand ser helwesta neyînî. Li hemberî vê helwesta neyînî helwesteke erênî jî heye. Kom û kesên ku xwedanê helwesteke erênî ne, dikarin rê li ber polîtîkayên pişaftinê bigirin û li çand û zimanê xwe vegerin. Plangerîya ji bo parastin û geşkirina zimanekî kêm zede van tiştan dide ber xwe:

***1***- Di warê zimanî da berzkirina hişyarî û hişmendîya civakê

***2***- Reftareke erênî li hemberî ziman û nirxên têkildarî zimanî

***3***- Hînkirina zimanî (bi taybetî hînkirina nifşên nû)

***4***- Bi domdarî geşkirin û bipêşvebirina zimanî (li zimanî zêdekirina bêje, qalib û şayesên nû)

***5***- Bikaranîna zimanî di hemû qadên jiyanê da.

Reftara li hemberî zimanî jî dişibe reftara li hemberî mirovan. Her wekî çawa mirov dema qels û lawaz dikeve, divê mirov bi xurekên taybet xwedî bike û dema ku birîndar be jî divê mirov birînê derman bike. Ziman jî wisa ye, dema ku qels û lawaz bibe, divê mirov bi xurekên taybet xwedî bike. Xureka zimanî jî bikaranîna wî ye; zimanek çendî di qadên cur bi cur ên jîyanê da were bikaranîn, ew çend geş dibe. Zimanê birîndar jî divê bi peyv, qalib û şayesên nû were dewlemendkirin, xebateke taybet û pisporane li serê were kirin. Armanca plansazîya zimanî jî zêdekirina axêver û qadên jîyanê yên zimanî ye. Axêverên zimanekî û qadên ku ziman tê da tên bikaranîn çendî zêde bin, ziman ew çend geş dibe. Heke di axêverên zimanekî da daxwazeke xurt a parastina zimanî hebe, kes nikare wî zimanî ji holê rake.

Dema ku em bala xwe didin civaka kurd, di gotinê da ew daxwaz heye; ji sedî 90ê kurdan dixwazin ku zarokên wan zimanê kurdî hîn bibin. Lê kedeke têr û tesel nadin. Bi ser da jî bi milyonan malbatên kurd bi zarokên xwe ra bi tirkî dipeyivin. Her wiha siyasetmedarên me jî dema ku qala zimanî dibe, qirikê li xwe diqetînin, propopandayeke hişk û rijî dikin, lê dema ku kar ket alîyê wan xwe tevnadin. Ev jî nîşan dide ku helwesta me ya zimanî zêde ne xurt e, pirî caran bi tenê di gotinê da dimîne. Lê bav û kalên me, dê û dapîrên me ji mêj ve gotiye, "Gotin û kirin nabe yek", dema ku kirin tune be, tu qîmeta gotinê nîn e.

Di warê parastin û geşkirina zimanî da xaleke girîng jî ev e; ji bo ku mirov ziman û çanda xwe biparêze û geş bike, divê mirov ji hemû derfetên heyî sûdê wergire û derfetên nû peyda bike. Îro li ber geşbûna çand û zimanê me kend û kospên zêde hene, lê em pirî caran ji derfetên heyî jî sûdê wernagirin û ji bo peydakirina derfetên nû jî têra xwe xebatê nakin. Bo nimûne, ev çend sal in ku derfeta waneyên vebijêrkî li hemû dibistanên Tirkîyeyê heye, her kes dizane ku ev derfet bi têkoşîna kurdan bi dest ketiye, lê belê ji bo ku em ji vê derfetê sûdê wergirin, me zêde tiştek nekiriye. Berevajî vê yekê, me bikaranîna vê derfetê red kiriye, em bi ser dewletê da neçûne da ku li her derê waneyên kurdî vebin. Li hemberî vê helwesta me ya sist, dewletê jî heta jê hatiye, rê li ber bikaranîna vê derfetê girtiye, bi dek û dolabên cur bi cur nehiştiye ku waneyên kurdî li gelek dibistanan vebin. Bi ser da jî salê bi tenê du-sê mamosteyên kurdî tayîn kirine.

Va ye dîsa dema dîyarkirina waneyên vebijêrkî derbas dibe, heta roja 9ê meha yekê divê zarok waneyên xwe yên vebijêrkî bineqînin, qet nebe em îsal bikin destpêk û heta ji me tê, em zorê bidin rayedarên dibistanan da ku waneyên kurdî jî li gelek cihan vebin.

# Çareserî bi diyalogan pêkan e

Gelê kurd di nav xeleka ji agir de di nav têkoşîneke mayînde de ye. Mijarên ku bi salan e tên nîqaşkirin di sala 2019'an de gihîştin astekê, lê îsal jî mijarên sereke ku dê bên nîqaşkirin yekîtî û statuya kurdan in

NAVENDA NÛÇEYAN

Sala borî ji bo kurdan saleke têr û tijî bû. Di wê salê de herî zêde mijara statuya kurdan, yekitiya neteweyî û parastina destkeftiyan di sala borî de hatin nîqaşkirin. Polîtîkayên ku li seranserê Rojhilata Navîn tên meşandin, bi taybetî jî nêzîkatiya dewletan a li ser her çar parçeyên Kurdistanê dê bibin mijara sekere ya îsal. Di van mijaran de nêzîkatî û helwestên partiyên siyasî, sazî û dezgehên sivîl ên kurd dê rewşa kurdan zêlaltir bike. Konseya rêvebiriya Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) li ser mijarên sereke yên Kurdistanê rawestiya û bal kişand ser pêşerojê.

Konseya rêveberiya KNK'ê geşedanên her çar parçeyên Kurdistanê yek bi yek nirxandin û mijarên li pêş kurdan yek bi yek anîn ziman. Di nirxandinên konseya rêvebir a KNK'ê de ev tişt hatin ragihandin: "Gelê kurd ji bo hebûn, azadî, wekhevî û jiyaneke bi rûmet têkoşînek mezin dide. Kurdistanî hêj bi temamî negihîştine van xwezî û daxwazên xwe yên rewa. Lê belê, her sal ji sala berê zêdetir nêzîkî armanca xwe dibin. Her çend ku em tekoşîna xwe ya neteweyî mezin bikin jî dijmin bi hemû hêza xwe êrîşî me dike.

**Pêşeroja başûrê welat**

Li bakurê Kurdistanê, êrîş di nav vê salê de jî bê navber berdewam kirin. Li hember van êrîşên dijwar hemû dînamîkên gelê me, bi fedakarî û qehremaniyeke mezin û bi berxwedanê êrîşên wan bê encam hiştin.

Li başûrê Kurdistanê, piştî dagirkirina Kerkûk û deverên din alozî bi temamî nehatiye çareserkirin. Mixabin em nikarin bêjin ku rêveberî û hêzên kurdistanî, ji dagirkirina Kerkûk û herêmên din, ders wergitin û yekitiya navxweyî xurt kirin. Hêviya me ew e ku di sala 2020'an de, gavên yekitiyê bên avêtin û ev pirsgirêk bên çaresekirin. Niha jî Iraq di nav aloziyek mezin de ye. Pêşeroja Iraqê ne diyar e. Ev rewş metirsiyan li ser herêma Kurdistanê jî bi xwe re tîne.

**Li Rojhilat û Rojava alozî**

Li rojhilatê Kurdistanê jî gelê me xweparast û têkoşîna xwe berdewam kir. Dewleta Îranê jî weke dewleta tirk, di nav vê salê de êrîşên xwe li hemberî kurdistaniyan berdewam kirin. Îran di nav xwe de pirsgirêkên mezin dijî. Ev pirsgirêk li hundir û li derve, her diçe mezintir dibin.



Rewşa Rojava, niha di nîqaşên navneteweyî de cihekî sereke digire. Hêzên parastinê, bi hemû awayî di rewşa îstîşarê de ne. Rêveberiya siyasî û îdarî jî, di nav xebateke berfireh a dîplomasiyê de ne. Pêwîstiya Rojava bi her awayî, bi alîkariyê heye. Parastina deskeftiyên Rojava, di rojeva Kurdistanê de xala sereke ye. Divê hemû hêz û dostên kurdan di nav çalakî û xebatan de bin. Xwedîderketina li Rojava, xwedîderketina li hemû Kurdistanê ye.

**Bila bibe sala azadiyê**

Gelê Kurdistanê ligel hemû êş, jan û her wiha li gel kêmasiyên xwe têkoşîna xwe domandiye. Kurd di nav xeleka agir ya ku dijmin pêxistiye de têkoşîna mayînê didin. Çi dibe bila bibe divê kurd bi ser kevin. Di doza Kurdistanê de, ji bilî serkeftinê tu rêyên din ên alternatîf tune ne. Kurd bi tifaqa navxweyî dê planên ku li ser wan tên kirin têk bibin.

Di şerê Rojava de, gelê me li seranserê Kurdistanê û derveyî welat bû yekdeng. Em hêvî dikin ku ev yekdengiya gelê me bibe bingeha yektiyek siyasî. Kurd bi çi rengî dibe bila bibe divê diyaloga navxweyî pirs û pirsgirêkên xwe çareser bikin. Bila sala 2020'an ji bo mirovahiyê bibe sala azadî, demokrasî û wekheviyê."

# Divê çareserî bi giştî be

NAVENDA NÛÇEYAN

Ji sala 2011'an heta îro, li dijî alozî û pirsgirêkên Sûriyeyê dewletên din û rejîma Sûriyeyê gelek civîn û kongre li dar xistin. Ev hewldanên ku hatin dayîn aloziya li Sûriyeyê ji holê ranekir û xizmet neda gelên ku li vir dijîn. Piştî ku di sala 2014'an li herêmê Rêveberiya Xweser ji bo çareseriya pirsgirêkên gelan û jiholêrakirina aloziya li Sûriyeyê hat avakirin, ket hewldanan, gavên berbiçav hatin avêtin.

Di sala 2018'an de komxebateke Sûrî-Sûrî hatibû lidarxistin û gelek kesayetên siyasî û lêkolînerên cîhanî tevlî komxebatê bûbûn. Di komxebatê de gelek mijar berfireh hatibûn nîqaşkirin. Hevserokê Meclîsa Qanûnsaz a Rêveberiya Xweser a Demokratîk a Herêma Cizîrê Hisên Ezam li ser girîngiya komxebatê rawestiya û got gelek mijarên ku dê bên pratîzekirin hatin nîqaşkirin û encamên girîng derketin holê. Ezam, destnîşan kir ku yekane rêya çareseriyê diyalog e, ne dûrxistin e.

**Rêveberiya xweser tê dûrxistin**

Ezam, di axaftina xwe de bi taybetî li ser rêyên çareseriyê rawestiya û wiha got: "Ji bo çareseriyê diyalog esas e û dê bi diyalogê pêşketin pêk bê, pirsgirêk bên çareserkirin. Lê divê ev diyalog dûrî civînên cîhanî û ajandayên derve pêk bên. Ji pêkhateyên olî, Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê û saziyên girêdayî wê bi tevahî ji civîn û kongreyên ku pirsgirêk tên nîqaşkirin bi zanebûn tên dûrxistin."

Der barê hewldanên ku dûrxistina civînên navneteweyî û komîteya destûrî de jî Ezam wiha nêrînên xwe anî ziman: "Hinek alî hewl didin me ji civînên navneteweyî û komîteya destûrî dûr bixin. Ew civîn xizmeta hewldanên çareseriyê nakin. Civîn û kongreyên ku li derveyî welat pêk tînin li gorî berjewendiyên xwe jî biryaran bigirin. Bi dûrxistinê çareserî ne pêkan e. Divê em di çareseriyê de şirîk bin."

**Divê çareserî bi giştî be**

Êrîşên ku di 9'ê cotmehê de li hemberî Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê pêk hatibûn bûn mijara nirxandina Ezam û wiha berdewam kir: "Tirkiye û êrîşên wê, li hemberî çareseriyê astengiyek e. Hikûmeta Şamê diyalogê tenê bi kurdan re dixwaze, ereb û suryanan naxweze. Em dibînin ku rêveberiya xweser nûnertiya tevahiya pêkhateyên herêmê dike. Divê çareserî bi giştî be. Hemû jê sûdê werbigirin, ne tenê aliyek. Ji bilî wê jî em tu çareseriyek din qebûl nakin."



# Talan dikin, wêran dikin û diçin

NAVENDA NÛÇEYAN

Bertek û nerazîbûnên li hemberî projeya Kanal Stenbolê her ku diçe zêde dibin. Gelek zanyar, ekolojîst û endezyar der barê texrîbatên kanalê de nêrînên xwe anîn ziman. Texrîbata ku dê bê kirin ji texmînan zêdetir e. Xweza tê texrîpkirin, jiyana ajalan dikeve xetereyê, her wiha projeya ku tê texmînkirin dê di nav 4 salan de bê temamkirin dê jiyana mirovên li vir dijîn jî serûbin bike. Guhertina cihên şebekeyên avê, xetên gaza xwezayî, kabloyên ceyranê, binesaziya bajêr hwd. dê bi xwe re pirsgirêkan bîne. Ligel wan pirsgirêkan jî ranta ku dê li vir bê bidestxistin mijarek din a nîqaşê ye.

**'Dawiya îktîdarê hatiye'**

Piştî daxuyaniya serokomar û serokê AKP'ê Tayyîp Erdogan a di 27'ê kanûnê de ya "Hûn bixwazin jî û nexwazin jî dê Kanal Stenbol bê çêkirin" siyasetmedaran bertek nîşan dan. Ji kesên ku bertek nîşan dan yek jê jî parlamenterê CHP'ê yê Stenbolê Ozgur Karabat bû. Karabat diyar kir ku gotinên Erdogan encama ferasteta wî ya siyasî ne û wiha got: "AKP û Erdogan bi vê ferasetê gel anî hemberî xwe. Li aliyekî beşên civakê yên cuda tune dihesibîne û li aliyê din ji Şaredarê Stenbolê re dibêje 'Rûnê li cihê xwe!" Em bi vê ferasetê re rûbirû ne. Erdogan bi projeya kanalê dê Stenbolê xera bike, wêran bike û hilweşîne. Di demên berê de dema ku hikumdarên zordest bajarek dagir dikirin û dawî li îktîdara wan dihat anîn dest bi talan û wêrankirinê dikirin. Niha helwesta AKP'ê jî wisa ye, hildiweşîne û diçe. Ji ber vê yekê pir aşkera ye ku dawiya Erdogan û îktîdara wî hatiye." Karabat, da zanîn ku mixabin îhaleya Balafirgeha Mezin bi dawî bû û wiha got: "Îhaleya pira Bogazê jî xelas bû. Lê divê hin îhaleyên din pêşkêşî sermayedaran bike. Ku wisa neke dê hesab ji AKP'ê bipirsin. Ji ber ku deynê wan heye. Niha dibêje 'Hûn çi dibêjin bibêjin, ez ê çêkim' ji bo ku bijî wekî din tu şensekî wî tune ye."

# Li gel bertekan tezkere hat qebûlkirin

NAVENDA NÛÇEYAN

Tezkereya ku wê leşker ji bo Lîbyayê bên şandin, li Desteya Giştî ya Meclîsê bi dengê AKP-MHP'ê hat qebûlkirin. Di dengdana vekirî ji 509 dengan 325 dengên erê, 184 deng jî na hatin dayîn. Biryara êrekirinê, ji hêla siyasetmedarên Tirkiyeyê ve, di serî de serokê Amerîkayê Donald Trump, Yekitiya Ereban, Misir û welatên din ve hat rexnekirin.

Serokê DYA'yê Donald Trump der barê mijarê de hişyarî da û got: "Ev yek wê bibe destwerdana li karên navxweyî yên Lîbyayê." Wezareta Derve ya Misrê bi daxuyaniyekê erêkirina tezkereyê şermezar kir û diyar kir ev biryara meclîsê wê pêvajoya Berlînê bi awayekî neyînî bandor bike.Rêveberiya Kahîreyê jî bi heman bertekê daxuyanî da û got, Tirkiyeyê Konseya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekbûyî ihlal kiriye û dê ev biryar li Deryaya Spî bandorê li îstîkrarê bike. Yekitiya Ereban jî biryara Tirkiyeyê bi tundî rexne kir û diyar kir ku ev biryar wê pevçûna li herêmê gurtir bike. Îsraîl, Qibris û Yewnanistan jî nerazîbûn nîşan dan ku destwerdana dewleta tirk a li Lîbyayê gefê li aramiya herêmî dixwe. Yekitiya Ewropayê piştî ku dewleta tirk tezkereya Lîbyayê ragihand, diyar kir ku ew 'bi fikar in' û wiha hat ragihandin: "Yekitiya Ewropayê baweriya xwe timî dubare dike ku krîza li Lîbyayê bi rêbaza leşkerî çareser nabe. Destekên ji bo aktorên vî şerî wê aloziya li welat û herêmê girantir bike."

# Şerê DYA û Îranê kûr dibe

Bêguman dewleta herî bi fikar jî dewleta Iraqê bi xwe ye ku bûye qada şerê Îran û Amerîkayê. Dibe ku ev êrîşa Amerîkayê rê li ber gelek geşedanên nû vebike

Mehmet Şahîn

Di serê sala 2020'an de ango di 3'yê çileyê de, di berbanga sibehê de fermandarê Parazvanên Şoreşê Hêza Qudsê ya Îranê Qasim Silêmanî hat kuştin.

Wekî ku tê zanîn demeke dirêj e Amerîka û Îran di Rojhilata Navîn de li dijî hev têdikoşin. Yek ji armancên Amerîkayê ya sereke ya hatina Rojhilata Navîn dorpêçkirin û bêbandorkirina Îranê ye. Yekane armanca Îranê jî şikandina dorpêça ser xwe û bêbandorkirina Amerîkayê ye. Lewre ev çend sal in Rojhilata Navîn bûye qada lîstika kişikê ya Amerîka û Îranê.

**Seferetxane hat şewidandin**

Îranê balafira Amerîkayê ya bêmirov xist, êrîşê qada niftê ya Siûdî kir, êrîşê baregeha leşkerî kir û leşkerek amerîkî da kuştin û herî dawî bi alîgirên xwe sefareta Amerîka ya Bexdayê dagir kir û seferetxane şewitandin.

Bêguman Amerîkayê jî hemleyên Îranê bê bersiv nehiştin. Yek bi yek bi awayekî herî giran bersivandin. Bersiva herî dawîn piştî kuştina leşkerekî amerîkî pêk hat. Amerîkayê di navbera sînorê Iraq û Sûriyeyê de êrîşê baregehên Hîzbulahê kir û 25 şervanên Hizbûlahê kuştin û nêzîkî 50 kes jî birîndar kirin.

**'Dê berdêl giran be'**

Îranê bi dagirkirin û şewitandina sefaretxaneyê bersiv da Amerîkayê. Piştî vê hamleya Îranê dora hemleyê hatibû Amerîkayê. Rayedarên Amerîkayê gef li Îranê xwarin û gotin dê berdêl giran be.

Amerîkayê di demeke kurt de bersiv da Îranê. Fermandarê Hêzên Qudsê yên Parazvanên Şoreşê Qasim Silêmanî û fermandarê hêzên Heşdî Şebî Ebû Mehdî El Muhendîs û çend hevalên xwe li balafirgeha Bexdayê bi fuzeyên Amerîkayê di wesayîtên xwe de hatin kuştin.

**Yekîneyên veşarî hene**

Qasim Silêmanî ji bo Îranê kesek gelek girîng bû. Fermandarê ew hêzên taybet bû ku parazvaniya şoreşa îslamî ya Îranê dikin. Wekî generalê xeyalet û şûrê Îranê yê li Rojhilata Navîn dihat pênasekirin. Hemû operasyonên Îranê yên derveyî welat bi plansaziyên wî û bi pêşengiya wî pêk dihatin. Hêzên paramîlîter ên ku li dijî dewletên din, an jî bo



destwerdana nav dewletên din dihatin bikaranîn hemû jî hêla wî ve dihatin birêxistinkirin û ji hêla wî ve dihatin birêvebirin. Milîsên li dijî dewletên Siûdî û Yekitiya Mîrekiyên Ereban şer dikin, Şerê navxweyî yê Yemenê, Hizbûllaha Lubnanê, milîsên ji bo piştigiriya Esad li Sûriyeyê şer dikin, Heşdî Şebî yên Iraqê hemû bi Qasim Silêmanî ve girêdayî bûn. Bêguman ev tenê yên xuyayî ne. Belkî bi dehan yekîneyên wî yên veşarî hene.

Lewre kuştina Qasim Silêmanî bi rastî jî bersiveke gelek giran bû. Bertek û nirxandinên piştî vê hemleyê derketin holê nîşan didin ku gelek kes ne li benda bersiveke wisa giran bûne. Di nav wan kesan de senatorê amerîkî jî hene. Hinek senatorên amerîkiyan bertek nîşanî vê hamleya Trump dan û wî bi "bêberpirsiyarî" tawanbar kirin û gotin, "Trump Amerîkayê dixe nav şer".

**Iraq bû qada şer**

Dewletên Rojhilata Navîn di nav tirs û fikaran de pêvajoyê dişopînin. Bêguman dewleta herî bi fikar jî dewleta Iraqê bi xwe ye ku bûye qada şerê Îran û Amerîkayê. Dibe ku ev êrîşa Amerîkayê rê li ber gelek geşedanên nû vebike. Dibe ku rê li şerekî nû yê ku hemû dewletên Rojhilata Navîn eleqedar dike vebike û Rojhilata Navîn bike gola xwînê.

## Tifaqa bêdilî

Felemez Ulug

Ji ber rewşa li Sûriyeyê çavê herkesî li ser Tirkiye û Amerîkayê ye. Lê pêwîst e mirov hêza herî sereke û diyarker Rûsya jî nede milekî. Li gorî wê bikaribe rewşa herêmê binirxîne. Bi taybetî piştî hewldana darbeyê ya 15'ê tîrmeha 2016'an, di tekîliyên navbera Tirkiye û Amerîkayê de dengeya heyî lewaz bû. Li gor vê rewşa heyî her kesên rewşa herêmê dinirxîne pirsa "gelo wê di navbera Rûsya û Tirkiyeyê de hevkariyek stratejîk pêk were an na?" kir.

Lê rastiya ku di dîrokê de hatiye jiyîn tu îhtîmalî nade ku hevkariya di navbera van her du dewletan de pêk bê. Sedema vê ya herî hêsan jî mirov dikare bêje, ji ber armanc û stratejiyên van her du dewletan ji hev pir dûr in. Ji milê din ve jî ev her du dewlet li herêmê rakîbê hev in.

Rast e, di dîrokê de gelek caran Tirkiye û Rûsya di nav hevkariyê de bûn, lê ev hevkariya wan tu carî veneguheriye asteke stratejîk. Her dem di asteke statîk ango taktîkî de maye. Yanî li gor rewşa heyî hevkariya xwe berdewam kirine. Lê bi dawîhatina vê rewşa heyî ve hevkariyên wan jî bidawî bû ye. Mînaka vê ya herî berbiçav jî mirov dikare rewşa li Sûriyeyê tê jiyîn binirxîne.

Niha li ser erdnîgariya Sûriyeyê berjewendiyên her du dewletan dihêle ku ew bi hev re di nav diyalogê de ango di nav tekîliyê de bin. Tirkiye jî dizane ku di mijara Sûriyeyê de dewleta herî bi hêz Rûsya ye û bêyî destûra vê dewletê ne gengaz e ku wê bikaribe tu gavan bavêje. Lewma heya ji destê Tirkiyeyê tê dixwaze di qadê de ew û Rûsya neyên beramberî hev. Rûsya jî dizane ku ger bi Tirkiyê re li hev neke wê nikaribe li Sûriyeyê aramiyê, ango îstikrarê ava bike. Ji ber vê yekê Rûsya hin mijarên Tirkiyeyê li ser ferz dikir neçar bû ku qebûl bike. Operasyona 'Bariş Pinari' jî yek ji van mijara ne. Lê piştî li herêmê berjewendiyên wan nemînin ango bidawî bibin, gelo ew ê starategiya her du dewletan jî vegere asta berê, yanî hevaltî û dostaniya wan ew ê bi dawî were an na?

Moskova dizane ku hêza wê ya polîtîk, aborî, leşkerî û teknolojîk têra rêvebirina pergala nû ya cîhanî nake. Daxwaza wê ya yekem ew e ku statukoya heyî berdewam bike û li gor vê jî xwe bike hêz ku bikaribe di qada navneteweyî de hebe. Rûsya dixwaze bibe hêza herî bi hêz ya cîhanê. Niha xwe di vê astê de dibîne. Lê ger statukoya heyî têk biçe ew ê ev jî destê Rûsyayê biçe. Ew vê dizane. Ji milê din ve jî bo îktîdara xwe li welatê xwe biparêze wan polîtîkayên derve wek amûrekî propagandayê bi kar tîne.

Ji ber van sedeman niha di stratejiya Rûsyayê de guhertinek wisa radîkal nîne ku bixwaze Tirkiyê ji welatên Rojavayî qut bike. Yanî kesên ku dibêjin, "Tirkiye ger bixwaze ji eniya welatên Rojava derkeve ew ê Rûsya bi keyfxweşiyek mezin wê pêşwazî bike" ev ne tespîtek di cih de ye.

Yên dibêjin "Rûsya bûyera balafira ketî ji bîr kiriye" jî şaş in. Sedama vê jî hesan e. Rûsya di dîrokê de tu carî Tirkiyê wek dost û hevkarekî stratejîk nedîtiye. Rûsya ne wek dijmin, wek her welatekî di çarçovaya berjewendiyên xwe de nêzî Tirkiyeyê dibe û li ser vî esasî siyasetê dike. Niha di navbera her du welatan de ji Sûriyeyê bigire heta Lîbyayê û ji peymanên aborî heya yên leşekerî têkiliyên wan hene. Lê ev gavên tên avêtin hemû taktîkî ne.

## PYD'ê kongreya YNK'ê pîroz kir

Piştî 4'emîn kongreya YNK'ê siyasetmedar li bendê ne ku YNK dê li herêmê û li derveyî herêmê polîtîkayeke çawa biafirîne. Pirsgirêkên siyasî, leşkerî û aborî her ku diçe li herêmê kûrtir dibin. Di vê demê de lidarxistina kongreyê ji bo gel û derdorên siyasî girîng tê dîtin.

YNK di 1'ê hezîrana 1975'an de hatiye damezirandin û heta niha 3 kongre li dar xistine. Kongreya dawî di sala 2010'an de hatibû lidarxistin. Ev kongreya 4'emîn e hat lidarxistin. Bi beşdarbûna hezar delegeyan kongre pêk hat. Navên endamên Encûmena Giştî ya Rêveberiya YNK'ê ya ku ji 121 kesan pêk tê diyar bûn.

Bi boneya kongreyê, hevserokên Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) Şahoz Hesen û Ayşe Hiso nameyek ji YNK'ê re şandin û kongre pîroz kirin. Di nameya ku hat şandin de bal kişandin ser deskeftiyên kurdan û siyaseta heyî û wiha hat gotin: "Kongre di merheleya ku Rojhilata Navîn û bi taybetî Kurdistan di pêşketinên çarenûsî re derbas dibe pêk hat. Serkeftina we, serkeftina me ye. Biryarên ku we dane û hûn ê bidin jî çawa li gorî we girîng in, li gorî me jî wisa girîng in. Çi der barê siyaseta kurdî dibe û çi jî siyaseta herêmê û navdewletî de, ev rewş wiha ye. Em bawer in ku di ev jî bi xwe re destkeftiyên dîrokî ji gelê me re bîne." *SILÊMANÎ*

## 'Ji hebûna saziyên îstîxbaratê aciz in'

NAVENDA NÛÇEYAN

Şandeyek ji Tirkiyeyê ku ji rayedarên MÎT'ê, endamên konsolosxaneya Hewlêrê û leşkerî pêk dihat hefteyên borî çû herêma Kurdistanê. Tê gotin ku şandeya îstîxbaratî û leşkerî ya tirk serdana hemû partiyên başûrê Kurdistanê kiriye û hinek daxwazên xwe bi partiyên Başûr re parve kirine. Her wiha mijara ku îstîxbarat li bajarê Silêmaniyê bi her awayî bi cih bûne jî rastî bertekên welatiyan hat.

Mijareke din a şandeyê jî boykotkirina kel û pêlên Tirkiyeyê bû. Şandeyê di hevdîtinan de hewl daye partiyên Başûr îkna bike ku ew ne li dijî wan in. Lê hate diyarkirin ku piraniya partiyên başûrê Kurdistanê neyînî nêzî daxwazên şandeya tirk bûne û hinek partiyan jî fikarên xwe yên der barê êrîşên li hemberî kurdan anîne ziman. Hin partî jî tenê bi guhdarkirinê re sînordar mane bersivek erênî yan jî neyînî nîşan nedane. Li gorî çavkanî û daxuyaniyan şande di van hevdîtinan de negihîştiye armanca xwe.

**Ji hebûna îstîxbaratê aciz in**

Ev hêrsa gel û helwesta neteweyî ya gelê Başûr, rayedarên tirk xiste nav liv û tevgerê. Hewldan li hemberî astengkirina xebatên yekitiya neteweyî bûye. Şandeyê di serdanên xwe de ji partiyên siyasî daxwaza tevlînebûna xebatên neteweyî kiriye. Xelkê bajarê Silêmaniyê der barê hebûna saziyên îstîxbaratê û hatina şandeyê li başûrê Kurdistanê bertek nîşan da.

Bahadîn Mihemed ê ku li Silêmaniyê dijî da zanîn ku welatên cîhanê bi hemû awayî çav berdane axa Başûr û bi taybetî jî welatên cîran û wiha got: "Başûrê Kurdistanê teslîmê dagirkeran hatiye kirin. Rojava, rojhilat û bakurê Kurdistanê jî di heman rewşê de ne."

**'Kes rewşa gel nizane'**

Welatiyê bi navê Goran Letîf jî da zanîn ku ger welatek bê derî û pencere be, asayîşa neteweyî nebe, bêguman wê ew welat bibe cihê sîxûriyê û wiha axivî: "Rêveberan bi salan e welatê me biçûk xistin û êdî di nav me de mezin nemane û kes rewşa gel nizane."

Li gorî Şêx Emer Berzencî jî ger baxek bê parêzvan be wê zindî biçin nav bax û wêran bikin. Ev welatê me jî bi heman awayî ye û wiha dom kir: "Welatê me ji ber ku bê rêveber e, rewşa me wisa ye. Pêwîst e hemû rêxistin û hizb bi dilsozî hev bigirin û ji bo pêşxistina welat kar bikin. Hebûna saziyên îstîxbaratê tê wê wateya ku li vir destûr hatiye dayîn, ger ev yek nebe, çawa dikarin li vir bin?"



# Di dîroka kurdan de qonaxeke girîng: Alayên Hemîdiyê

Alayên Hemîdiyê yên ku di sala 1890'an de hatibûn damezirandin nêzî 40 salî di erdnîgariya Kurdistanê de çalak bûn. Heya roja îro ev alayên leşkerî di çarçoveya "Komkujiya Ermenan", "netewperestiya kurdan" û "têkiliyên kurd-ermen û Osmaniyan" de hatine nirxandin. Ev alayên ku di bin navê siltanê demê Ebdulhemîd de hatibûn damezirandin, çend caran navê xwe guhertine, lê hebûna xwe dîsa jî parastine. Ev yekîneyên leşkerî bêguman ji ber şertên demê yên polîtîk û îdarî hatibûn damezirandin. Her wiha Alayên Hemîdiyê û duajoyên wê (yên wek "Alayên Eşîretan yên Siwarî", "Alayên Îhtiyatî yên Siwarî", "Alayên Eşîretan", "Alayên Milîsan yên Minêkar") di periyoda di navbera salên 1908-1919'an de xwedî rolên mezin bûn, ku di vê peryodê de kurd ji dewleteke serbixwe hatin mehrûmkirin.



**Valahiya desthilatiyê**

Di salên 1840'an de, li ser tesfîyekirina mîrên kurd, ermen bê parastin dimînin, yên ku dewsa mîrên kurd digirin jî (şêxên Xalidî, axayên herêmî û begên bajarî) wek mîran li hemberî ermenan birehm nebûn. Valahiya desthilatiyê û anarşiya li Kurdistanê bi kêrî vê çîna desthilatdar ya nû dihat, her wiha hem şêx hem axa an jî began ji ermenan bac werdigirtin. Bêguman "cotbacdayîn", xebatên mesîhîtiya revîzekirî û anîna zanistên fenî-sosyal yên ji aliyê mîsyoneran ve dibe sedem ku netewperestî belavî nav gundên ermenan bibe. Bi vî şiklî, "pirsgirêka ermen" di lîteratûrê de cih digire. Di sedsala 19'emîn de tê zanîn ku Rûsya çav berdide erdnîgariya Kurdistanê, ji ber vê çavberdanê û propagandayên alîgirên ermenan yên li Ewropayê, pirsgirêka ermen dikeve rojeva navneteweyî. Di sala 1878'an de yekem car di Kongreya Berlînê de pirsgirêka ermen tê rojevê, di dawiya nîqaşên polîtîk de biryar tê wergirtin ku "Dewleta Osmanî dê êdî ermenan li hemberî kurdan û çerkezan biparêze" (bend 61). Berovajî vê bendê, piştî kongreyê dewleta Osmanî bêhtir nêzî kurdan dibe, ji ber ku dewletê hez nedikir ku wek Balkan û Ewropaya rojhilatî, li Asyayê jî erdê xwe winda bike.



**Sedat Ulugana**

Di sala 1881'î de tê zanîn ku Şêx Ubêdullahê Nehrî hem li hemberî Osmaniyan û hem jî li hemberî îraniyan serî radike. Siltanê demê Ebdulhemîd, li ser vê serhildanê, êdî pêşengên olî yên kurd di siyaseta Osmanî de îzole dike

**Ji eşîran yekineyên leşkerî**

Di sala 1881'î de tê zanîn ku Şêx Ubêdullahê Nehrî hem li hemberî Osmaniyan û hem jî li hemberî îraniyan serî radike. Siltanê demê Ebdulhemîd, li ser vê serhildanê, êdî pêşengên olî yên kurd di siyaseta Osmanî de îzole dike û heya ji destê wî tê dike ku bandora wan mînîmîze bike, her wiha ji ber ku hêzên begên bajarî yên Kurdistanê bendkirî bûn, êdî tenê di destê wî de axayên eşîrên mabûn. Herî dawî, Ebdulhemîd ji eşîrên kurd yên sunî yekîneyên leşkerî pêk tîne. Bi vî awayî, dike ku bandora şêxên Xalidî û begên bajarî yên herêmî êdî teqez mînîmîze bike û li hemberî xwestekên ermenan ên polîtîk û dagirkeriya Rûsyayê ya muhtemel tedbîr bigire û eşîrên kurdan bêhtir kontrol bike.

**Li hemberî ermenan**

Ahmet Şakir Paşa, ew 12 sal (1878-1889) bûn ku li Rûsyayê sefîr bû, alayên kazakan ên Rûsyayê li ber çavên xwe dîtibû. Tê zanîn ku li ser pêşniyaza wî, fikra damezirandina alayan bi vî şiklî di nav erdnîgariya Osmanî de peyda bûye. Herî pêşî waliyê Erziromê dikir ku ji kurdên herêmê li hemberî komîteyên ermenan tîmên leşkerî yên gerok çêbike, bes reîsên kurdan yên wê demê li hemberî vê xwesteka walî disekinin. Ji ber ku walî dikir ku wan wek yekîneyên operasyonel di tixûbên Rûsyayê de bi kar bîne. Lê kurdan baş dizanibû ku dema ew bikevin nav tevgereke wiha, herî pêşî wê ji aliyê Rûsyayê ve bêhtir werin cezakirin. Her wiha Rûsyayê çend caran ew bi tundî ceza kiribûn. Piştî biryara damezirandina alayan, Siltan Ebdulhemîd ji bo damezirandina yekîneyan Muşîr Zekî Paşa peywirdar dike û dişîne Serheda Kurdistanê. Muşîr Zekî Paşa jî peyderpey ji eşîretan alayên leşkerî peyda dike. Di serî de eşîrên kurd ji hatina Muşîr Zekî Paşa şikdar dibin, hez nakin endamên wan werin jimartin, dema ku dibînin armanca Muşîr xalis e, wî bi kelecaniyeke mezin pêşwazî dikin. Her wiha ew kurdên ku ji ber tirsa zîndankirinê ew çend sal bûn newêribûn berjêrî bajaran bûbûna, ji bo xweqeydkirina nav van alayan, berjêrî bajaran dibin. Ji van yek jî ji eşîra Cibrî Zubêr Axa bû. Li gor Zekî Paşa, kirinên rêvebir û memûrên dewletê yên bi vî şiklî, zirar dida tevlêbûyîna alayan. Divê ecele cezayên endamên eşîretan ên berê werin efûkirin. Damezirandina alayan wek raya giştî a hundirîn, raya giştî ya derve jî dilepitîne. Zêdetir rojnameyên biyanî fikarên xwe yên der barê çekdarkirina kurdan a li hemberî ermenan tînin ziman.

**43 alay damezirandin**

Di sala 1891'an de bi sedan axayên kurd serî li dewletê dixin ji bo ku dewlet ji eşîrên wan alayên leşkerî pêk bîne. Her wiha yên ku herî pêş serî li dewletê didin, eşîrên bi navên Cibrî, Camedanî, Hesenî, Qarapapax (ne kurd in) û Sîpkî ne. Paşê peyderpey ji eşîrên wek Ademan, Heyderan, Milan jî alay tên çêkirin. Ev pêvajoya çêkirina alayên leşkerî ji eşîran heya sala 1892'an berdewam dike, di dawiya heman salê de (piraniya wan kurd) ji pênciyî zêdetir eşîrên sunî alay peyda dibin. Heya sala 1893'an ji van eşîretan ser hev 43 alay tên damezirandin. Me çawa li jor jî gotibû ku bi sedan axayên eşîran serî li dewletê xistibûn ji bo ku dewlet ji eşîrên wan alayan damezrîne, lê dewleta Osmanî tenê serlêdanên eşîrên sunî dipejirîne. Serlêdanên eşîrên durzî, elewî û êzidî tên redkirin. Ji ber ku ewnan di nezera dewleta Osmanî de "girseyên ewle" nebûn. Her wiha serlêdanên hin eşîrên sunî yên mezin jî nayên pejirandin, mînak eşîra Pencînarî ku serekê wê Bişarê Çeto û eşîra Xweytî ku serekê wê Hecî Mûsa Beg bûn, di berê de serê dewleta Osmanî pir êşandibûn, dewleta Osmanî bi tu awayî hez nedikir ku eşîrên pir bi hêz tevlî refên alayan bibin. Her wiha dewlet, serlêdanên eşîrên kurd ên sunî yên piçûk ên bêhêz jî nedipejirandin.

**Mala Emer û Mala Şewêş**

Me li jor jî behsê kiribû ku rojnameyên beyanî fikarên xwe dianîn ziman, di sala 1893'an de em dibînin ku ew ji ber van fikarên xwe mafdar in; ji ber ku alayan pê re, pêşiyê dest bi talan û şerên navxweyî kiribûn. Bi taybetî, qebîleyên eşîreta Hesenan (Mala Emer û Mala Şewêş) bi hev dikevin û ji hev bi sedan mêran dikujin û dewlet mecbûr dimîne çend mufreze leşkerên nîzamî bişîne herêmê. Li ser hewldanên rêvebirên fermî şerên di navbera Hesenan de disekinin. Her çiqas berhevkirina bacê ya ji aliyê serleşkerên Alayên Hemîdiyê qedexe bû jî lê dîsa jî ewana vê peywirê bi zorê hildidin ser xwe. Gundên ku bacê nadin wan, ji aliyê wan ve tên talankirin. Piştî talankirina gundan a ji bo bacê, vê carê Alayên Hemîdiyê berê xwe rasterast didin gundên ermenan.

**Meseleya Rizayê Xalit**

Di serkêşî û aloziya van salan de (1893-1900) axayekî ji axayên eşîra Hesenî yê bi navê Rizayê Xalit derdikeve pêş. Em dê êdî navê Riza bêhtir di arşîvên Osmanî, heya di arşîvên Ûris û îngilîzan de jî bibînin. Rizayê Xalit çawa ku nav jî li ser e kurê Xalit Begê Hesenî bû; bi emir ciwan û bi karakter pir hişk û bi hêrs bû. Li gor îdîayên îngilîzan, Riza peyderpey gundên ermenan ên li devera Mûşê talan dike û hasilatê jî dibe Erziromê difiroşe. Paşê berê xwe dide gundên êzidiyan û van gundan jî talan dike, ji van gundan yek jê jî Dêrik e. Kurdên êzidî heya Siltan Ebdulhemîd nameyan dişînin û wî gilî dikin. Em dibînin ku Riza ji bilî ermenan, kurd jî şêlandine. Çawa ku em ji raporên Osmaniyan ên wê demê fehm dikin ku Rizayê Xalit ji aliyê tu rêvebirê herêmî ve nayê zevtkirin, ji ber ku Alayên Hemîdiyê rasterast bi Muşîr Zekî Paşa ve girêdayî bûn, Muşîr jî bi Siltan Ebdulhemîd ve girêdayî bû.

**Êrîşî sîpkiyan kirin**

Piştî kirinên Rizayê Xalit du sê sal şûnde birayê wî yê bi navê Fetilah derdikeve holê û êrîşî eşîra Sîpkî dike. Bi taybetî di navbera wan û malbata Ebdulhemîd Begê Sîpkî de şerên çetin rû didin. Ev şerên di navbera alayên Hesenan û Sîpkan qederekî berdewam dikin. Fetilah Beg dibe qaçax. Lê xuya ye ku êmla rêvebirên Osmanî li ser Hesenan e, lewra şer û dozên alayên Hesenan ên navxweyî çareser dikin û bi vî awayî Fetilah Begî jî efû dikin.



# Mergê cinîyan yeno tîtîknayene

Serra 2019 seba cinîyan baş derbaz nêbî û qetilbîyayîşê cinîyan zêdîya. Derheqê babete de Sosyolog û Rayîrbera Komeleya Cinîyan ya Roza Ruken Erguneşe qisey kerde

MERKEZÊ XEBERAN



Ma kewtî serra neweye. Umudê her kesî oyo ke çîyê xirab ê ke serra 2019î de ameyî cuyayene 2020î de nêrî cuyayene. Her çiqas ke her kewtişê serra neweye de umud wina bibo zî her tewir şîdet eksê kêmîbîyayîşî zêdîya. Ma bi xeberanê qetilkerdiş û îdîayê 'xokiştişê' cinîyan dest bi serra neweye kerdî. Na babeta zaf hessasî de medya herinda ke sebebê xorî yê qetilkerdiş û xokiştişê cinîyan analîz bikera, çîyê tewşan sey sebeb nawnena. Tena Çewlîg de hewteyo peyên yê 2019î de yanî kewtişê serra neweye de di cinîyê şenikî ke ame îdîakerdene ê xo kiştî, merdî. Goreyê dayeyanê KCDPyî serra 2013î de 237, serra 2014î de 294, serra 2015î de 303, serra 2016î de 328, serra 2017î de 409 û serra 2018î de 440 cinî ameyî qetilkerdene.

Avûkat Muzzeyen Boylu Amed de, Gullu qezaya Amedî ya Erganî de, Emîne Bulut Kirikkale de verê çianê domana xo û her kesî de, Ayşe Tuba Arslane Eskîşehîr de û Ceren Ozdemîre Ordu de hetê kesê bi nameyê Ozgur Arduçî ke zîndan ra fîrar kerdbî ra ameyî qetilkerdene. Yanî ma eşkenê wajime ke serra 2019 seba cinîyan baş derbaz nêbî û qetilkerdişê cinîyan zêdîya.

Derheqê babete de Sosyolog û Rayîrbera Komeleya Cinîyan ya Roza Ruken Erguneşe qisey kerde. Ruken Erguneşe qiseykerdişê xo de bale ante qetilbîyayîşê cinîyan, sebebê xokiştişê cinîyan, parekerdişê medyaya komelkî, xebetnayîşê medyaya komelkî, medya de dayîşê xeberanê qetilbîyayîş û xokiştişê cinîyan ser û daye zanayene ke heta ke cinîyî azade û seyyewbînan nêbî, nêeşkenê qala azadîye û yewîye bikerî.

**Şîdet senî vila beno?**

Erguneşe destpêkê qiseykerdişê xo de bale ante Tirkîya de zêdebîyayîşê hûmara şîdet, qetilbîyayîşê cinîyan, întîxar û binpaykerdişan ser û wina va: "Şîdet qasê ke tu wextêk de hende zêde nêbibî, ameyo meşrukerdene. Ma benî şahidê raybazanê tewr wexşî yê şîdetî. Eynî roje de bajaranê cîya-cîyayan de cinîyî yenî qetilkerdene û ma bi xeberanê winasî dest bi roje kenî. 'Întîxarê Êlihî' hema zî vîrê her kesî de yo."

**Sebebê şîdetî çi yo?**

Erguneşe dîyar kerde ke serra 2019î de Amed de 12 cinîyî ameyî qetilkerdene û mergê 3 cinîyan sey întîxar derbazê meqamanê edlî bî û wina dewam kerde: "Sebebê întîxarê cinîyan oyo ke cinî bêçare yenî veradayene û heme şertê cuye destê cinîyan ra yenî girewtene. Bi no hawa mergê cinîyan yeno tîtîknayene û sey întîxar yeno mojnayene. Şîdet çiqas şono zêdîyeno û xo resneno her raşteyê merdimîye. Ganî merdim her hedîseyêk tena serê xo nêercno. No probleman hîna xorî keno. Şîdet çi yo? Sebebê şîdetî çi yo? Çi tewirê şîdetî esto? Şîdet senî vila beno? Heta ke cewabê nê persan nêro dayene, mumkun nîyo ke ma vera şîdetî de têkoşîn bikerî û asteng bikerî."

**Mergê her cinîyêk polîtîk o**

Erguneşe dewamê qiseykerdişê xo de daye zanayene ke şîdet binpaykerdiş û mekanîzmayê kontrolkerdişî yo û va: "Sîstemo serdest camêrd o û nêseyyewbînanî ra hêz gêno. Sîstem medya ser de propaganda keno û vatiş cuye de şekil gêno û beno şîdet. Ewro heme kanalê TV û çapemenî xizmetê sîstemî de yî. Ê çerxê şîdetê mird kenî û şîdet danî daîmîkerdene. Hunermend, serkêş û wezîrî seba ke hêz û qewet bidî sîstemî dişmenîya cinîyan kenî. Bi no hawa her raşte de şîdet yeno meşrukerdene. Mergê her cinîyêk polîtîk o. Sîstem seba domnayîşê xo bi seserran o (şer, qirkerdiş) şîdet xebetneno. Bi kayanê daîmî merdiman rê hîssê 'seke teberê cuya ma de cuyêka bîn esta' dano hîskerdene. Înan ra yew zî 'teorîya zure' ya. Eke her roje bi îstîkrarî eynî zure bêra eştene û qiseykerdene, do şar cayêk ra dima bawer bikero. Na teorîye aîdê Gobbelse ya û Gobbelse hetkarêsereke yê Hîtlerî ra yew o. Dinya de tena gandaro ke ferqê mergî de yo, tena merdim o. Cigêrayîşê ke dinya de mabenê grubanê cîya-cîyayan de ameyî kerdene de ame vînayene ke vîdeoyê derheqê mergî nijadperestî, muhafazakarî û zayendî zêdînenî. Na babete de cigêrayîşê bêhûmare estî. Yanî şîdet eslê xo de cayo ke nîno aseyene de yeno berardekerdene û komelî rê yeno qebulkerdene."

**Ganî xebat bêrî kerdene**

Erguneşe qala muracatê ke Komeleya Cinîyan ya Roza rê ameyî kerdene, kerde û wina va: "Ma komîsyomê cinîyan û odeya meslekan yê ke Amed de xebatan rayîr benî, reyde ameyî têhet. Ma aşma adara 2019î de protokolêko 3 madeyan ra pê yeno, îmze kerd û ma qerar da ke ma do pîya bixebetî. 9 aşman de 1792 muracatê ke ê raştê şîdetî ameyî, ma rê ameyî. Pêroyê cinîyê ke muracat kerdî, hetê camêrdan ra raştê şîdetî ameyî. Cinî her tewir şîdetî reyde rî bi menda. Pêroyê muracatan de ame vînayene ke se ra 85ê cinîyan raştê şîdetê psîkolojîk ameyî. Verê cû wexto ke şîdet ameyêne vatene, şîdeto ke bi çiman yeno vînayene ameyêne vîrê merdimî. No metod metodo ke tewr zêde yeno xebetnaye ra yew o. Ganî xebatê zanayîşkerdişî bêrî kerdene. Sewbîna metodo bîn zî şîdetê dîjîtalî yo. No metod bi rayîrê mesaj, telefon û medyaya sosyalî yeno vilakerdene. Bi rayîrê înan fotografî yenî antene, yenî parekerdene, tehdîtî yenî kerdene û swb."

**Beno ke tesîrêko çep bibo**

Erguneşe qiseykerdişê xo de va 'Ma eşkenê vajime ke cinî eynî wext de raştê her tewir şîdetî manenî' û domnaye: "Şîdetê fîzîkî, şîdetê ekonomîke, şîdetê psîkolojîk û şîdetê sosyalî. Ganî cinîyî her tewirê şîdetî baş bizanî. Vernîgirewtişê qetlîyam de gama yewine a tewr muhîm na ya. Ma zanê ke cinîyê ke ameyî qetilkerdene verê cû bidesan reye raştê şîdetî ameyî. Her tewir şîdet cinîyan anceno verê qetilkerdişî. Medya de qetilkerdişê cinîyan yeno kategorîzekerdene. Seke hîkayeya her yewî biba. Sernameyê balkêşin nêerzenî. Sey nimune 'mêrdeyo ke ame xapênayîş can girewt' û sebebê camêrdî yenî maritene. Şîdeto tewr tesirîn şîdetê postmodernî yo û bi rayîrê medyaya sosyalî yeno vilakerdene. Qet şik çino ke medyaya sosyalî hetê vetişê raştîyan de raybazêko tesîrin o. Labelê parekerdişê dîmenê bêzanayîş, tesîrêko çep virazeno. Yanî ozentî virazeno û beno sebebê travmayêko diyîne."

**Întîxarê cinîyan mergê şikin î**

Erguneşe qiseykerdişê xo yê peyênan de va 'ma proseso ke întîxarê benî rojeve ra derbaz benî. Xo ra ma zanê ke şer, krîz û rewşanê îstisnayîyan de întîxarî zêdîyenî. Hedîseyê întîxarî kewenî rojeve û xeber benî, coka ra hûmara întîxaran zêdîyeno' û wina qedênaye: "Tîya de ziwanê medya zaf muhîm o. Ma Amed de bi zanayîş hedîseyê întîxaran nêkerd raporanê xo. Labelê ma komeleyê berpirsîyaran hîşyar kerd. Întîxarê cinîyan zî mergê şikin î. Ewro Amed de 3 mergê şikin yê cinîyan estî û ma do heta peynî taqîpkarê înan bibî. Ganî merdim hetê xebetnayîşê medyaya sosyalî de baldar bibo. Ganî her kedkarê çapemenî hesas têbigêro û hetê dayîşê fotograf û nuştişê xeberan de dîkat bikero. Heta ke cinîyî azade û seyyewbînan nêbî, nêeşkenê qala azadîye û yewîye bikerî."




## Dîyarê Ma



Cemîl Oguz
cemilo@diyarname.com

# Ez anketçî niya!

Ez çalakî Enstîtuya Kurdî ya Stenbolî ra vecêna. Lezê mi est o. Gere ez biresî cay xo. Bi leze leze ez gaman erzena. Nişka vera jo vano:

- Deqeyke!

Kuçe de kam veyndo mi, muhîm niyo ew parsek bo, firoşkar bo yan zî çikew bîn bo, ez vindena û goş dana ci. Ew ten kam beno wa bibo însan o û ez zey însanî nizdê cê bena. Wexto vengê "Deqeyke" yeno, ez vindena, vero xo açarnena.

- Ew vano:

- Ez anketçî niya! Ez wazena çike vacî?

Ez bi pers bersivê ê dana:

- Ma qey anketçîtî çikew xirab o?

Ew şoq beno. Hîvey bersivêke aneyîn nêbî. Şaş beno. Ziwanê cê girêdiyeno, nêzano vaco çi. Ez persê xo dibare kena:

- Erê, qey anketçîtî çikew xirab o?

Serê persê min ê diyin ra yeno xo ser, vano:

- Nê bira, to şaş fam kerd, min nêwaşt ana vacî…

Ez vana:

- La, to waşt vacê çi?

Vano:

- Wexto anketçî wazenê anket bikerê şar hêrs beno, loma mi ana va. Ma qeybî karê …… alikarî danê pêser. (Ez nêwazena tiya qalê karê cê bikerî loma ewca min veng verda)

Ez vana:

- Ka, vace ez çawey alîkarî to bikerî? To enka karekê qic vîna, to merdimê ke ê karî kenê, yanê to anketçî qic vînay, to anketçî kerdî binê erd î. Ti enka çawey bi enî karê xo nan wenê, anketçî zî bi karê anketî nanê xo wenê.

Bi kerdişê xo ti anketçiyan xirab vînenê, ti bi namey înan dest bi veyndayişê merdinê reyra şinê kenê û ti alîkarî wazenê…

Merdim vano:

- Bira qisûr mawne, wele niyetê mi ana nêbî.

Ez vana:

- Beno niyetê to ana nêbo, beno ke şar anketçiyan ra aciz zî bo, la ti anketçiyan nêparêznenê, ti şarî ra nêvanê 'bawnê ê zî bi enî karî nanê xo wenê' ti înan qic vînenê, ti zî înan xirab nîşan danê. Ka ez çawey alikarî to bikerî? Qisûr mawne, ez nêşkena to rê alikarî bikerî.


Merdim serey xo keno verê xo û vano:

- Wele ti heqliyê.

Bê ke ez bikerî derge ez alikarî cê nêkena, ez vana "bi xatirê to" û ez rey xo dewam kena.

Her kes zano la ma reyna vacê; Dinya de bi seyan, hezaran, deh hezaran, belkî zehftir karî estê. Her kes bi karê ke nanê xo weno. Anketçî zî bi karê xo. Heme karî verî heme çî qeybî xizmetiyê, anketçîtî zî karêke anayîn o. Ez bi xo anketçî niya, la ez qedr û qîmetê yînan zehf zana. Ê kedêke zehf e danê, perey ke tay gênê.

Tirkiya de henî desthilatdarî zehf qîmet danê anketan. Henî estê zehftir qîmet danê anketan, her game, hema vace her aşme anket virazenê. Miyanê ma kurdan de astê anket û qîmetdayînê anketan tay o. Seranê peyinan de newe newe qîmetê anketan beno vila…



## Zavayê bê hempa



Zava serê sibehê zû ji xew rabû û çû taştiyeke xweş amade kir û anî nav livînên bûkê. Hêdî bang li bûkê kir û got: “Delala dilê min rabe taştêya te amade ye.” Bûkê çavê xwe vekir çi bibîne taştiyek wiha amade kiriye ku encax mirov ji xatûnan re amade bike. Bûk û zavê taştêya xwe bi hev re xwarin û zava rahişt sifreyê bire kîlerê û li vegerê misînek av û teşt anî odeyê û ji bûkê re got hewce nake biçî serşoyê were dest û rûyê xwe bişo. Bûkê bi nazdarî spasiya wî kir û got tu her hebî delalê dilê min.

Min nizanibû tu ewqasî mirovekî pêşketî û jentilmenî. Paşê zava got xwe aciz neke û xwe hinekî din li ser textê xwe dirêj bike ez ê biçim van tiştan bibim û vegerim.

Zava dîsa hat û 2 fincanên qehwê di dest de ji bûkê re got de rabe delala min em biçin şaneşînê qehweya xwe jî bi hevre vexwin. Niha xwendevan dibêjin ev çi derew e, ma zilamê wiha hene. Ez jî dibêjim ka bêhna xwe fireh bikin.

Werhasilî piştî qehweya xwe jî vexwarin êdî zava ji bûkê re got. Binihêre ev tiştên min îro kirin tu yê her roj bê kêmanî wiha ji min re bikî. Her sibeh beriya ku ez herim karê xwe divê tu bê kêmanî van tiştan yek bi yek bikî. Te fêm kir ne wisa. Bûkê wekî ji xewneke şêrîn ji xew rabe, bêyî dilê xwe got erê ‘bavo’ min niha baş fêm kir…

# Kamyona min e û ez azad im

Carekê yekî ereb ew ê barê kamyona xwe ya zebeşan bibira halê. Riya ku tê de dimeşiya hinekî teng bû û diviyabû ku li destê rastê bifitile da ku biçe halê. Beriya bigihîje halê li şûna ku (sinyala) ronahiya rastê vêxe ya çepê vêxist û bi rastê de zîvirî. Wesayîta ku ji paş wî ve dihat lê qelibî û qeza kir. Ajokarê kamyonê û yê erebeya ku lê qelibî daketin xwarê û xwe rakişandin hev, ew dibêje tu neheqî yê din dibêje tu neheqî. Welhasilî diyalogekeke wiha di navbera wan de derbas dibe:

***Ajokarê erebeyê:*** Kuro lawo tu ronahiya xwe ya çepê vêxistiye û tu bi rastê de zîvirî, ma wiha dibe.

***Ajokarê kamyonê:*** Kuro ka binihêre barê min çi ye?

***Ajokarê erebeyê:*** Barê te zebeş in.

***Ajokarê kamyonê:*** Hal li kîjan alî ye?

***Ajokarê erebeyê:*** Li aliyê rastê ye.

***Ajokarê kamyonê:*** Madem tu zanî barê min zebeş in û hal li aliyê rastê ye gerek te zanîba ez ê bi aliyê rastê de herim.

***Ajokarê erebê:*** Lê te ronahiya sinyala xwe ya çepê vêxistiye.

***Ajokarê kamyonê:*** Lawo lembe lembeyên min in û kamyon kamyona min ,e ma bi serê te ketiye ez kîjan lembeya xwe vêxim û bi kîjan alî de bizîvirim.



Şûjin

Dildarê Amedê

## Nexweşiya Ehmed Huseynî

Xwedevanên hêja, ez dizanim ku kul û derdên me têr û sertêra me hene, lê tevî her tiştî jî mafê me ye ku em jî wekî xelkê jiyaneke xweş û bi rûmet bijîn. Her wiha mafê me heye ku em bikenin jî, ne tenê bigrîn. Bi her halî di vê nivîsê de dixwazim bi we re serpêhatiyekê parve bikin.

Beriya çend salan helbestvanê hêja Ehmed Huseynî bûbû mêvanê Amedê. Ehmedê me yê cansivik û wek çipkan, vê carê rewşa wî xerab bû. Ehmed ji ber êşa kaboka xwe nema dikaribû bi rê ve biçe û gopalek xistibû destê xwe.

Ehmed ji min re got ji bo xwedê ka bipirse doktorekî baş yê nexweşiyên hestiyan bibîne da ku em çareyekê ji vê êşa xwe re bibîne.

Min jî ji çend hevalan pirsî, Sîdar Jîr navê doktorekî da min û got biçin ew gelekî baş e. Min û Ehmed meberê xwe da nexweşxaneya wî doktorî.

Bi rastî dema ez çav li doktor ketim min di dilê xwe de got ev rebenê xwaro maro û pişt quluz nikare xwe rast bike êdî dê çawa Ehmed rast bike.

Em ketin hundir me derdê xwe ji doktorî re got. Ez dibêjim me, ji ber doktor bi kurdî nizanibû, lewra Ehmed digot û min jî bi tirkiya xwe ya (orjînal) jê re werger dikir.

Di navbera diyalog û wegera gotinên doktor û Ehmed de ji nişkan ve Ehmed di ber xwe de got : “Mêro encax deh hebin karibin vî doktorê we rast bikin îca çawa ew ê min rast bike.”

Doktorê me yekî piştxilûz û qulûz bû.

Ez keniyam û min got na mamoste gelekî pesnê wî didin wê di çend rojan de te rast bike, bike wekî zêr.

Doktor got ew çi dibêje?

Min got ew dibêje gelo ez ê di çend rojan de ji vî gopalî xelas bibin û normal bimeşim.

Welhasilî doktorê me derman û derzî ji Ehmed re nivîsandin û ji me re got min hebên êşbir û derziyên sistkirina rehan jê re nivîsandin.

Ehmed got: “Kuro ev çi dibêje ew derziyên çi ne?”

Min got dibêje ew derziyên sistkirina rehan in.

Ehmed got: “Çawa yanî ew kîjan rehan sist dikin kuro. Ka ji doktor bipirse ew tenê rehê lingê min ê sist bikin an jî hemû rehan.”

Beriya wergerînim doktor jî mesele fêm kir û got erê erê hemû rehan sist dike.

Doktor ji min re got : “Hevalê te neketiye derdê rihetbûna çogên xwe ew bi vî halê xwe jî di kêfa xwe de difikire.” Ez serê we neêşînim Ehmedê ne bi dilê xwe be jî ji neçarî ew derman kirîn û piştî çend rojan êdî li ser nigê xwe geriya û gopalê xwe avêt.

Bi her halî Ehmedê me bû wek deq. Ya rast xebera doktor bû wekî meseleya sofî lê hatibû. Sofiyek roja înê li wazê meleyekî camiyê yên bi pereyan guhdarî dike û dema ku mele dibêje roja qiyametê kesên bi tirkî nizanin ew nikarin îfadeya xwe bidin û dê herin dojehê, sofî dest bi giriyê dike. Kesên derdorê dibêjin heyra tiştek nabe em ê te hînî tirkî bikin. Sofî dibêje heyra ez neketime hetra xwe ez xema pêxemberê me dixum feqîro bi tirkî nizane wê çawa îfadeya xwe bide.





# Ji bo penaberan xêz dike

**Di vê dema ku gelê me û bi giştî gelê Sûriyeyê li gelek deveran ji ber şer û pevçûnan koçber û penaber dibe, şêwekarê kurd Ekremê Zavê dê dahatuya tabloyên ku difroşe bibexşîne zarokên paneber**

NAVENDA NÛÇEYAN



Şêwekar Ekremê Zavê ji bo sala nû li ser malpera xwe ya civakî daxuyaniyek balkêş daye. Zavê dibêje seranserê sala 2020'an ew ê hatineyên tabloyên xwe ji bo zarokên ji ber şer û pevçûnan penaber bûne bibexşîne û bi vî rengî alîkariya zarokên penaberan bike.

Ekremê Zavê dibêje amade ye ku hemû sala 2020'an tabloyên xwe ji saziyên xêrxwazî û alîkariyê her wiha ji pêşangehan re pêşkêş bike. Zavê dixwaze hatineyên wan tabloyan bibin alîkarî ji bo zarokên ku li seranserê cîhanê ji ber şer û pevçûnan bûne penaber.

**Li derdora me şer e**

Zavê li ser sedema vê biryarê jî wiha dibêje: "Ez li deverekê dijîm ku derdora me şer û pevçûn e û min bi çavên xwe dît ku çawa zarok bi darê zorê ji malên wan tên derxistin û tevî malbatên xwe bê cih û war dimînin."

**Di vê sermaya zivistanê de**

Zavê helwesta saziyên navneteweyî rexne kir û wiha got: "Her wiha ev biryara min ji ber xemsariya saziyên navneteweyî yên berpirsiyariya kar û barên penaberan dikin jî derket. Ji ber ez rewşa van malbat û zarokên wan dibînim û gelekî pê diêşim. Di vê sermaya zivistanê de di bin konan de dijîn û tu saziyeke navneteweyî destê alîkariyê dirêjî wan nake."

**Dikarin tabloyan bikirin**

Şêwekarê kurd Ekremê Zavê axaftina xwe bi van gotinan temam kir: "Lewre jî banga me li hemû saziyên hunerî û xwediyên pêşangeh û kesayetiyên e ku bixwazin dikarin tabloyên min bikirin û wan hatinan ji bo zarokên penaber werin xerckirin. Ne tenê ji bo zarokên li derdora bajarê min lê ji bo hemû zarokên penaber li kîjan devera cîhanê be."

**Ekremê Zavê kî ye?**

Ekremê Zavê di sala 1974'an de li bajarê Amûdê yê rojavayê Kurdistanê ji dayik bûye. Zavê bi karekter û şêweyê xwe yê cuda bala hunerhezan dikişîne ser tabloyên xwe. Heta niha Zavê tevlî gelek pêşengehên taybet û yên komî bûye. Zavê yek ji şêwekarên kurd ên rojavayê Kurdistanê ye û li bajarê Hesekê dijî.


## Nûçeyên xwendevanan...

Di vê beşê de em ê hewl bidin nûçeyên ku xwendevanan ji rojnameyê re dişînin biweşînin.

# Dengbêjekî nemir; Ebdulkerîm

Ednan Goyan

Her civak, dever li gorî rastiya siruşt û civaka xwe deng û awazên cuda derdixîne. Bajarê Mûşê jî çendîn dengbêjên navdar û hêja jê rabûne yek ji wan, Ebdûlkerîm Demîr ango bi navê din Ebdulkerîm Yusif e. Dengbêj Ebdulkerîm di sala 1962'an de li Gimgima (Varto) Muşê ji dayik bûye, navê dayika wî Zînet e. Dengbêj Ebdûlkerîm hîn di zarokatiya xwe de dengek gelek xweş li ser bû. Dengxweşî û dilgermiya wî ji xweşikbûna xwezaya Gimgimê dihat, hîn zarok bû li koçik û dîwanan rûdinişt û guhdariya dengbêjan dikir. Ew evîndarê dengbêjan bû, gelek ji kelepûra kurdî hez dikir. Vê evîniya wî wisa lê kir, roj bi roj wî ber bi hembêza dengbêjiyê ve bir û stran ji ber kir û got. Di wî temenê biçûk de li dîwana dengbêjan rûdinişt û diçû li govend û dîlanên gundiyan, stran digotin. Êdî wisa lê hat dema dawetek li gund an jî gundên derdorê çêdibûn diçûn banî dengbêj Kerîm dikirin. Wê demê jê re digotin dengbêjê biçûk, dibirin dawetên xwe.



Piştî şerê li Kurdistanê yên salên 1990'î dengbêj li ber lehiya koçberiyê dikeve û berê xwe dide bajarê Stenbolê. 25 salan ji war û milkên xwe dûr, li xerîbiyê jiya.

Digel koçberî, feqîrî û hejariyê, lê dîsan dev ji strangotinê bernade û li dawet, şahî û dîwanan dîsan jî stran digotin. Mixabin demek dirêj e li hemberî nexweşiya pençeşêrê li ber xwe da. Di 31'ê tebaxa 2019'an de li Stenbolê, çû ber dilovaniya Xwedê.



Weswese 2

Şener Ozmen

# Hebû, tune bû

Li gorî Sickertî, bersiva girîngîpêdayîna hunermendekî/ê, di vê pirsê de veşartî ye: "Gelo çi berhemên berbiçav ên ku îhtimala ku ji aliyê nifşên piştî xwe neyê dîtin ji holê rake, li dû xwe hiştine yan na?" Îro ro, aktorên wê yên li cîhanê belavbûyî, xwe wekî hunermendekî/e kurd ê/a hevçax nebînin û tew bilêv nekin jî –ku ev pirseke sereke ye–, hunereke hevçax –ya ku kirasekî tenik ê kurdayetiyê li xwe kiriye– heye û her ku diçe, bertekiya xwe ya dijberya xweserî xwe winda dike û ji hunera hevçax a tirkan, ji berê bêhtir rol didize. Gengaz e wekî haya we ji vê meseleyê tune be, bi dehan salan e ku hunermendên 'kurd' tevlî pêşangehên navneteweyî, tevlî bîenalan, trîanelan û fûaran dibin. Çi li vir û çi li derveyî vir, bi sernavine seyr –bêguman dûreşer–pêşangehên xwe yên takekesî yên White Cube, li dar dixin û berhemên wan, tevlî koleksiyonan (çi yên taybet, çi yên muzeyan) dibe. Hûn dê texmîn bikin, wekî di van qonaxên hunerê de, hunermendên kurd, bi tenê di henga afirandinê de kurd in! Lewre, kêşeya xwemalî û nimînendetiyê, di qonaxên din ên vê şêwehilberînê de awayekî ji awayan, nayê dîtin an jî bi taswasa ku berhem an jî pêşengeh, bi etîketa 'kurd' bête dexmekirin, gelek caran bi destê hunermendî/ê bixwe tê kuştin. Çi ku li Tirkiyeyê ti koleksîyoner –her weha ti muze–, ew berhem çendî serkeftî û çendî xweserî xwe be jî, dê nexwaze tiştekî xwerû kurd tevlî koleksîyona xwe bike, tew tevlî pêşangehekê jî!

Lêbelê em dizanin wekî her pêşengeh, her fûar, her nûçeyek an jî nivîseke rexneyî yên di kovarên hunerî de derdiçin, bi armanca ku bêhtir vexwendiyan bikişînin, hunermend bêhtir bê axaftin û gelek kesên din jî tevlî vê fûryayê bibin, tên lidarxistin. Dibe ku hûn kurd bin, di vir de ti pirsgirêk nîne (helbet li gorî hin deman), belam jiyîna bi berhemeke xwerû kurd re, fena jiyîna bi bombeyeke bêteşe ya li ber teqînê tê dîtin. Ji destpêka salên 90'an heya roja îro, min ti koleksîyoner yan galerîstekî/e tirk nedîtiye wekî ji bo hunermendê/a wî/wê bêhtir bibe kurd, wî/wê pîj bike, her weha min ti hunermendekî/e hevçax ê/a tirk nedîtiye ku hunermendên kurd wekî kurdekî/ê bipejirînin.

**Kêliyeke muhteşem!**

Baş e, tiştê ku hatibû piştperdekirin çi bû? Pêşengehdanêra navdar Carolyn Christov-Bakargiev, di hevpeyvîneke xwe de (2014, User's Manual) hetika me biribû; anîbû gotibû ku; "Heke Rene Block bîenala navneteweyî îcad kiribe, Rosa Martinez jî vê bîenala paralel a navneteweyî û cîgeyî ya Tirkiyeyeke ku daw û doza tevlîbûna Civata Aborî Ya Ewropayê dikir, ava kir. Ji ber ku li welêt pirjimarî hebû, bîenal jî ne otorîter bû, ne bi tenê tirk, di heman qatê de jî kurd bû. Ji bo hunermendên kurd, ev kêliyeke muhteşem bû, lewre tirkîyeyê dixwest bibe endamê Civata Aborî Ya Ewropayê. Dixwestin pirjimariyê, pirçandiyê, pirrengiyê û demokrasiyê şanî wan bidin. Yên ku piştgirî didan bîenalê her Kemalîst–û sekuler– bûn ku îro jî, heman der û dor e ya ku piştgiriyê dide hunermendên kurd ên diyarbekirî." Jixwe bi dû vê pêvajoyê, hunermendên kurd li hemberî xwesansûrê jî demîna xwe girtin û tiştên ku di ber berhemên xwe yên navend kurd re digotin jî, gelek bi hêsanî hatin paşguhkirin. Piştî demekê kavilên Diyarbekirê, piçik û pariyên jiyana kurdan, çîrok û metelokên wan ên bijan, kurt û kurmancî mêjûya wan î req û rût, bi hişsivikiyeke ku ji me re gelek asayî dihat –û tê–, bûn sermijarên vê hunerê. Wekî ku civaknasê fransî Pierre Bourdieu jî digot, sermiyana çandî, fena amûreke pêkutiyê, zordestiyê kar kir. Kurd, ji bo kil û kêmasiyên xwe şanî efendiyên xwe yên sermiyana çandî bikin, bibin pêkenînoka der û dorên hunerî, li ser mêjûya xwe bi xwînsariyeke metelhêl xebitîn. Naxêr, ez ê nebêjim wekî kurdbûyîn bûye mode, ku bi demekê, di der û dorên hunerî yên li Stenbolê de bîr û baweriyeke bi vî rengî jî hebû. Bi demê re, gelş û teşqeleyên nîgaşî û niqaşî (kêşeya navend û hawirê) yên bi Stenbolê re jî bi dawî hatin û pê re pê re, rê li ber hunermendên gewrîqul ên stenbolî yên ku Kurdistanê, fena welatekî ku bi tenê tawanên namûsê lê rû dida, disêwirandin, vebû.



**Fatê were dawetê!**

Bo mînak, hunermenda tirk a zirfemînîst Şukran Moral, di sala 2010'an de, bi navê Ya Zewicî û Bi Sê Mêran, li gundekî Mêrdînê performanseke vîdeoyê li dar xistibû ku qaşogiravî, bal dikişand ser mijarên weke zewacên zarokan, zebr û zora mêran û kêşeya namûsê. Moralê, di vê performansa xwe de bûkanî li xwe kiribû û sê xortên kurd ku li gorî vehunanê her sê xort jî mêrên wê bûn, li meydana gundî, bi mest û gêj li dora wê didan lotikan. Di hiş û hoşeyê wan de xaknîgareke bi paş de mayî (heye ku xwe bi xwe bi paş xistibûn) hebû û zixtika wan tê de nebû. Çi xweş rave kiribû Foucault (2005, Rola Siyasî Ya Rewşenbîr); "Serê ewil ên ku têk çûbûn –ku heke yên têkçûyî hebin– li gorî pênasê ji wan kes û kûsên ku ji gotinê hatibûn bêparkirin dihatin pê! Û heke bi tevê vê yekê jî bi peyivîna, dê neşiyana wekî bi zimanê xwe gilî bikin. Zimanekî biyanî li ser wan hatibû ferzkirin. Ne ku bê zar û ziman bûn." Niha em dipên, em dipên da ku hinek ji me li xwe varqilin û demildest dev ji vê behbîriyê berdin! Lewre, huner be jî, weke agirê pûş e, arkeolojiya ku li ser û binê şêwejiyana vî gelî tê birêvebirin, bo kurtemaweyekê dilê hinek der û doran dike cî, belam gend û gemara wê her û her dimî ne. Yên min ne ku pend û şîret in, naxêr, bi tenê pîj di min re diçin çi gava guhên xwe li gilîgotinên hunermendên kurd fît dikim; li gorî texayula wan em li ser kavilên welatekî ku bi behîdaran mişe ye, dijîn.

**Çemê Dînbûnê**

Hunera hevçax a kurdan, li Diyarbekirê şîn bû û dîsan li heman bajarî hişê xwe winda kir! Pa çawan? Bi min ji gurrbûnê û ji lezê… Di Şerefnameyê de qala çemekî tête kirin; "Eşîrên herî mezin û bihêz ên li Imadiyyeyê ya yekem Mizûrî û ya duduyan jî Zêbarî ne. Zê, navê çemekî piçûk ê wilayeta Imadiyyeyê ye. Ew eşîra duduyan, ji bo ku li derûdora wî çemî rûdinin, navê wî çemê piçûk lê hatiye kirin û jê re gotine Zêbarî. Navê wî çemî yê erebî jî heye û jê re Nehr'ul-Cunûn (Çemê Dînbûnê) dibêjin. Çunkî ewqas gurr û bi sur'et diherike, ev navê han lê kirine."

Bi hêviya ku tewqê xwe ji gelek tiştan bibirin, sersala we pîroz be!

xwebûn


6-12 Çile 2020 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 4 TL Hejmar: 3

*İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:* Kadri Esen
*Sorumlu Yazıişleri Müdürü:* İdris Gürmez
*Yayın Danışma Kurulu:*
Abdulla Peşêw
Ehmed Huseynî
Kakşar Oremar
Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev
Selîm Temo
Dr. Zerdeşt Haco
*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

*Yönetim Yeri:* Kooperatifler Mah. Gevran Cad. Akkoyunlu No: 5/13 ***Yenişehir / Diyarbakır***
*Baskı:* Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı ***Bağlar / Diyarbakır***

Keştiya Alalû

**Agît Yazar**



# Parîs û Tokyoya serdema xwe: QOTÊ BERÇEM



Ji bo lêkolîna li ser Qotê Berçemî, ez li Antalyayê li balafirê siwar dibim. Ser û binê rêwîtiyê, saetek û çend deqe ye. Ji Antalyayê heta balafirgeha Amedê, her ez li Qotê Berçemî difikirim.

Jixwe dema balafir ji bo danînê nizm dibe, derdora Erxeniyê, ango cihê Qotê Berçem xweş xuyanî dibe. Ez ji jor ve çavê xwe li cihê Qotê Berçem dipelînim. Lê balafir xwe di wexta xwe de danayne. Pîlot, bi wê şêwaza xwe ya resen, bi kubarî anons dike: "Rêwiyên me yên qedirbilind!" Ji ber tevgera balafirên leşkerî, em ê çend deqeyan bi derengî xwe li balafirgehê deynin! Û balafir li dora Amedê doş dibe.

Ez di ber xwe de dikim pilepil û çend gotinên nexasim aydê xwe, ji nav lêvên xwe dipekînim (Ev gotinên min ên der barê wê rewşê de, qet nedişêbiyan gotinên pîlotê balafirê yên kubar).

Ez vê rewşê ji xwe re vediguhezînim awantaj û hinekî din derdorê radiçavînim. Hinek zevî hatine dirûn, hinek jê hîn li dar in, hinek zevî jî hîn şîn in. Wiha fêm dikim ku ev zeviyên şîn, yên garis in. Zeviyên ajotî, zeviyên hîn nû hatine dirûn, zeviyên serridî û pirêzeyên nola rengê zêr û zîv, buxçika pîrika min Hecî Fatê a ji gelek pîneyên rengo rengo pêk dihat, tînin bîra min. Çemekî ziravik nola werîsekî şîn, boxçika pîrika min Hecî fatê, efû ango zeviyên rengo rengo kiriye du tîş. Ez di dilê xwe de dibêjim: "Hebe tunebe Qotê Berçem, li ber vî çemî ye û ez ji xwe re noqavî gerrîneka dîroka Qotê Berçemî dibim.

Qotê Berçem, li derdora 11 hezar sal beriya niha tê avakirin û bingeha bajarvanî, sewalvanî û cotkariyê tê danîn. Bi gotineke din: mirovên hingê dev ji jiyana Paleolîtîk berdidin û dest bi jiyana Neolîtîkê dikin. Tê gotin ji sed hezaran sal berê û heta 10-11 hezar sal beriya niha, mirovan bi nêçîr û bi gihaberhevkirinê debara xwe dikirin. Lê paşê şoreşa xwe ya Neolîtîkê pêktînin; ji şarge û şikeftan derdikevin, li ber avan ji xwe re avahiyan çêdikin, paşê ajalan ji xwe re dermale dikin û piştre jî dest bi cotkariyê dikin. Ev her sê tişt bi hev re bi pêş dikevin. Tekerê balafirê yê dawî bi erdê dibe û bi veciniqîn ez ji gerîneka dîroka Qotê Berçemî dipengizim der...

**Pola, Mîkrop, Tiving**

Profesorê erdnîgarî û fîzyolojiyê zanîngeha Kalîforniyayê, Jared Diamond, li ser pirseke mirovekî Gîneya Nû, dest bi lêkolîneke dike. Ev lêkolîna wî, tam sî sal dajo û piştî lêkolîneke dûr û dirêj kitêbek bi navê Pola, Mîkrop û Tiving çap dike. Paşê jî dikomenterekê bi heman navî çêdike.

Jared Diamond, dibêje: "Min 148 heb ajalên gihaxwur ku giraniya xwe di ser 45 kîloyan re ne û li reşayê dijî jimartin. Lê tenê 14 heb ji wan, di nav demajoya 10 hezar salî de hatine kedîkirin. Ev her 14 heb ajalên hatine kedîkirin evin: Çêlek, mîh, bizin, beraz, hesp, deve, deveyên cot milik, ker, gameş, pezkoviya renê, gayê tîbetê, çêlekên kovî, çêlekên balî û lama. Ji van ajalan tenê lama ji parzemîna başûrê Amrîkayê ye. Wekî din her 13 heb ajalên din, yên Asya, Ewropa û bakurê Afrîkayê ne. Pirê van ajalan jî, make-welatê wan, Kevana/Hîlala Zêrîn e; ango ji Mezopotamyaya Jorîn in.

Prof. Jared Diamond di kitêba xwe de dibêje: "Ev ajalên hanê ji Kevana Zêrîn, derbasî Hindistan, Çîn û Ewropayê bûne. Ne tenê ajal, her wiha genim jî ji Kevana Zêrîn li dinyayê belav bûye." Jared Diamond pêde diçe û dibêje: "Heta 400 sal beriya niha, ne yek çêlek û ne jî simbilek genim hebû li parzemîna Amerîkayê. Lê niha tenê li Amreîkayê 100 milyon çêlek hene û salê 20 milyon ton genim tê hilberîn (ev dane ya sala 1997'yî ye. Lewra kitêba Jared Diamond di vê salê de hatiye çapkirin).

**Li Qotê Berçemî kedîkirin**

Em ji Amedê diçin navçeya Erxeniyê û em ji wir jî berê xwe didin Qotê Berçemî. Gundek heye li nêzî Qotê Berçemî. Hema hema her malek, pramîdeke ji sergînan li ber malên wan tê dîtin.

Gava em diçin nêzî Qotê Berçemî, em li naxirek dewaran rast tên. Naxir, ji çêlek û ciwangeyên rengên ji hev cuda pêk tê. Hingê ez li çêlekên niştecih û li çêlekên Holanda difikirim û wan rûberî hev dikim, bê çawa erdnîgarî, zîndewaran diguherîne. Her wiha ez zeviyên ceh, genim, nîsk û nokên li derdorê radiçavînim. Hêjayî gotinê ye ku hîn jî li qeraçê Qerejdaxê, ceh û genimê bejî şîn tê. Niha şivanekî li derodora Qerjdaxê, her roj wî genimê ku Prof. Jared Diamond e qalê dike û sî salî li ser lêkolîn kiriye, dibîne.

Eger awayekî bi awayan rojekê tovê ceh û genim ji ser rûyê erdê tine bibe, meriv ji nû ve dikare li derdora Qerejdaxê, tovê genim û ceh ji nû ve hilberîne. Ev yeka hanê bi serê xwe îspata lokolîna Prof. Jared Diamondî ye.


**Av, avahî û bajarvanî**

Wexta mirovan dev ji jiyana nêçîrvanî û berhevkirina pel pincarê berdane, ewil xwe berdane delavên avan û ji xwe re sitargeh ava kirine. Loma jî pêşiyên me navên wan sitargehên xwe kirine "avahî/avheyî". Avahiyên Qotê Berçem, sê cure ne. Malên wan ên ewil, nola hefşoyan guroverik in. Arkeolog dibêjin, niştecihên Qotê Berçemî, cara ewil di van avahiyên gurover de jiyîne û ev cure avahî, destpêka jiyana Neolîtîkê ne. Piştî nêzî hezar sal di ser re derbas dibe, vêca avahiyên binê wan bibist, ango avahiyên binê wan nola derabeyan ava dikin. Cara dawî jî avahiyên hîn nûjen ku her yek ji wan ji çend menzelan pêk tê, ava dikin. Meriv bi hêsanî dikare bibêje, ti cudahî di mavbera wan avahiyên hingê û yên heta 20-30 sal beriya niha li vê herêmê de tune ye.

Wexta ez li nav avahiyên Qotê Berçemî digerim, ez xwe bi xwe derdikevin rêwîtiya 10 hezar sal beriya niha. Belê, ez wer hîs dikim ku ez çûme Parîs û Tokyoyê. Lewra di wexta xwe de, heta niha ti bajarekî bi qasî Qotê Berçemî, ev çend mezin û ev çend qerebalix nehatiye dîtin. Hesab bikin, serjimara merivan Qotê Berçem, nêzî hezarî bûye. Li gorî wê demê, ev serjimareke pir û pir qerebalix e. Ma ser û binê serjimara merivan tevdek li ser rûyê vê dinyaya gewrik çiqas bû qey?

Em ji Qotê Berçemî derbasî Şikeftên Hîlarê yên hema li wî aliyê çem in, dibin. Ji wir jî em dîsa di nav wî gundê ku piramîdê ji sergînan li ber malên wan bûn re, derbas dibin.

Emîn ê qemereman ê ku dron di ser Qotê Berçemî re firandibû û dîmenên bê qusûr girtibûn, erebê bi lez û bez diajo. Qalikê min li qoltixa kêleka Emîn ê qemereman e, lê hîn jî giyanê min li nav niştecihê Qotê Berçem ên 10 hezar sal beriya niha ye.



Ez bi wan re kevir datînim ser dîwarê xaniyên wan û em bi hev re hîmê gund û bajarvaniyê datînin. Em bi hev re pirr şa dibin. Lewra xaniyên me bi destê xwe ew lêkirine, hem me ji sir û seqema zivistanê û hem jî me ji kelekela germa havînê diparêze. Em ajalên henûn û bi fêde ji xwe re kedî dikin. Him em ji şîrê wan, him ji hirî, çerm, mû û ji goştê wan sûdê werdigirin. Em ji xwe re kûçikekî xwedî dikin, da ku ew ajalên me ji dirîndeyan bihefidîne. Paşê jî em bi hev re li derdoro Qerejdaxê ceh û genimên bejî berhev dikin û ew li nêzî malên xwe, di erdê guncaw de diçînin.

Genimê me şîn tê û diseride. Em diçin paleya genim û ji şahiyan, em straneke paleyê ji ber xwe ve dibêjin. Paşê hinek kes, ji derdora Deryaya Spî tên bajarê me. Ew genim ji me dixwazin, em jî kespik û hestîkên ajalên deryayê yên di stuyên wan de, ji wan dixwazin. Dan û standina di navbera me de, wanî didome. Ew ajal û genimê me ji xwe re dibin li welatê xwe kedî dikin û diçînin. Bi xêra me ew jî dest bi jiyana cîhwarbûyînê dikin. Em jî xişrên wan dixin sutuyê xwe û rengekî xweşik didin jiyana xwe.

Bi vî awayî asta jiyana niştecihên Qotê Berçemî ya xweşguzariyê, bilind dibe; temenê wan dirêjtir dibe û di zikhev de 30 salî dijîn. Bi vî awayî mirina zarokan jî kêm dibe. Êdî ji 10 zarokên wan, tenê çar-pênc heb jê dimirin.

Emîn ê qemereman, erebê ber bi Amedê ve diajo. Her diçe, qalikê min û giyanê min ji hevdu dûr dikevin. Qalikê min di nav pilazayên bajarê modern ên li Amedê digere, giyanê min jî dimîne li nav avahiyên Qotê Berçemî yên ku cara ewil bi destê benîademiyan ve hatine lêkirin.

Elî Reza Spahî Layîn



# Kurdên dûr û dilên nêzîk

Di nav kurdên Xorasanê de û helbestên gelêrî de, helbesteke sê rêzîn (sêxiştî) heye ku dibêje;

*Welatê me Erzirûm e*
*Bi giya û gul û tûm e*
*Heft salêm ez jê dûr bûme*

Ma ev helbesta biçûk, bi naveroka xwe ya bilind, behsa çi dike? Cudahî û dûrketineke dijwar û xembar û nîşana jan û êşên ketî dilê kurdên Xorasanê di destpêka koça wan a dîrokî ji dayika welêt (Kurdistan) ber bi Xorasanê ve.

**Xorasan li ku ye?**

Parêzgeha Xorasanê li bakurê rojhilatê Îranê ye. Di dîroka vî welatî de Xorasan xwediyê cihekî taybet û rolên girîng e. Piranîya serdar û rêveberên bihêz û helbestvan û nivîskarên navdar û bibandor li wir ji dayik bûne an jî jiyane. Her wisa hebûna mezarê Îmamê 8'an ê şî'e (Reza) li navenda Xorasanê (bajarê Meşhedê an Tûsa kevnar e), kesayeta vî welatî berbiçavtir kiriye.

Di welatekî wiha de, serhildan û şer û dijayet û tevkujî jî zêde bûne.

Ev rewş, hatiye domandin heta serdema Sefeviyan (1501-1722); paşayên ku bi eslê xwe kurd bûn, lê bi zimên tirk. Û vê dewleta şî'e, biryar da ku bo parastina tixûbên rojhilatê Îranê ji erîşên tirkman û ozbekan, bi hezaran malbatên kurd ên êlên zaxorî û şadî û hwd, koçberî Xorasanê bikin.

Ev yek pêk hat û bi vî awayî mertalekî zindî ji can û xwîn û çekên kurdan, bû çepera Îranê û bingeha parastina wî welatî. Helbet dûrxistina gelê kurd ji Kurdistanê û pêşîgirtina li yekbûn û serhildanên wan, mebesta yekem bû niha, ji vê serdema girîng a dîrokî, derdora 450 salî derbas dibe û kurd li Xorasanê bûne xwediyê hêz û hejmareke mezin. Lê, di vê navbera 450 salî de çi bi serê kurdên Xorasanê hatiye? Niha ew di çi rewşê de ne? Destkeftiyên wan çi bûne û çi ji dest dane?

Mirov dikare bi vegotin û bersivandina van pirsên girîng, dest bi şîrove û ravekirina rewşa îroyîn a kurdan li Xorasanê bike. Ez ê hewl bidim di hejmarên paşerojê ya rojnameya Xwebûnê de çîroka jan û êş û şahî û hêviyên kurdên Xorasanê ji we re bibêjim. Weşana Xwebûnê li gelê kurd ê serfiraz pîroz dikim û bi vê helbestê nivîsa xwe temam dikim:

*Surr...*
*Û min pirs kir:*
*Surra ewqas kuştin û zordarî û bêrêzî û newekheviyê di cîhanê de çi ye?*
*Got; ev e ku mirov, bi qasî ku ji kujerê/a xwe hez dike, ji evîndarê/a xwe hez nake...*
*Hînga, li min nihêrî û bi halê kelogirî pirs kir:*
*Tu bibêjî, heger evîndareke/î hejar û kujereke/î hêzdar, di eynî demê de bang li te bikin bêjin, 'were cem min', tu yê berê xwe didî kîjanî?*
*Ez bêdeng mam û çavê min, li cihekî dûr, li pey bersiva xwe ya xembar digeriya!*